# ÇAND Û SINC

## NAVÎN 1

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Çand û Sincê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM: ÇAND Û SINC ........ 7

Çand çi ye? ........ 8

Sinc çi ye? ........ 11

Çêbûn û pêşketina çandê ........ 15

Sinc û rêgezên wî ........ 18

BEŞA DUYEM: DI DÎROKÊ DE ÇAND Û SINC ........ 21

Di civaka xwezayî de çand û sinc ........ 22

Di serdema Neolithic (Kevirî ya Nû) de pêşketina çand û sincê ........ 24

Di şaristaniyê de çand û sinc ........ 26

Çand û sincê nûjen ........ 30

BEŞA SÊYEM: ÇAND Û CIVAK ........ 33

Têkiliyên mirov û civakê ........ 34

Têkiliyên di navbera çand û ziman de ........ 38

Nasnameya çandî -1 ........ 41

Nasnameya çandî -2 ........ 44

Nêzîkatiyên li hemberî derdor û giyaneweran ........ 47

BEŞA ÇAREM: RÊGEZÊN SINCÎ ........ 51

Rêzgirtin ........ 52

Rêzgirtina baweriyên civakî ........ 57

Hezkirin -1 ........ 63

Hezkirin -2 ........ 68

Hezkirin -3 ........ 73

Berpirsiyarî ........ 76

Di civakê de bêmafî û mafdayîn ........ 80

**BEŞA PÊNCEM: XIRABKIRINA ÇAND Û SINCÊ ........................ 85**

**Xirabkirina Çand û Sincê ............................................................... 86**

**Bandora teknîk û medyayê di xirabkirina çand û sincê civakî de 89**

**Taybetiyên li dijî çand û sincê civakî - 1 ....................................... 94**

**Taybetiyên li dijî çand û sincê civakî - 2 ....................................... 99**

## BEŞA YEKEM: ÇAND Û SINC

### 1- Çand çi ye?

### 2- Sinc çi ye?

### 3- Çêbûn û pêşketina çandê

### 4- Sinc û rêgezên wî



**Wane 1**

# Çand çi ye?

**Çand:** Hemû nirxên heyberî û rewanî ne ku di encama keda mirovahiyê de, bi milyonên salan hatine afirandin.



**Çandê,** ji bo hêsankirina jiyana mirov pêwîstiyên girîng ava kirine û bi pêş xistine, ji ber vê yekê, çand nasnameya mirov bi xwe ye.

**Çand du cure ne:**

**1. Çanda rewanî:** Mîna: raman, bîrdozî, huner, ol û hwd.

**2. Çanda heyberî:**

Mîna: avahî, çandinî, teknîk, cil û berg, xwarin û hwd.

Ziman jî, hem rola çanda heyberî, hem jî ya rewanî dilîze.


Dîroka civakan jî, çanda wan e. Berhemên dîrokî (pirtûk, şûnwar…) ji bo nasnameya çandî, xwedî cihekî girîng in. Eger mirov çandê bi pêş nexe, nikare bijî. Eger mirov çanda ku ava kiriye neparêze, wê demê nasnameya xwe jî, winda dike.

**Çand:** Mirov bi xwe ye. Ji ber vê yekê, yên ku çanda xwe neparêzin, kesayeta xwe winda dikin; lewma mirovên ku çand

û sincê xwe neparastine, di nava civakê de taybetiyên wan ên nebaş çêdibin û ji wan re, **"mirovên bêçand"** tê gotin.

Bi kurtasî, em dikarin bibêjin ku çand, nasname û kesayet e.

- ✓ Mirov weke cureyekî zindiyan bi çanda xwe, xwe li ser rûyê erdê, mayînde kiriye.
- ✓ Bingeha civak û mirovahiyê, bi çand û sinc tê avakirin. A girîng rêgezên jiyana mirovan, bi çand û sinc hatine avakirin. Ev jî bi rêya civakên sincî û ramyarî, dikare bê bipêşxistin.



## Pirsên Nirxandinê:

1. Li gorî têgihiştina xwe, çandê pênase bike.
2. Çand, nasname û kesayeta mirovan e, binirxîne.
3. Çawa mirov dikare çanda xwe bi pêş bixe?
4. Valahiyên li jêr dagire:

**Çand: Hemû............ heyberî û rewanî ne, ku di .......... keda mirovahiyê de, bi milyonên salan ................ .**

**Çanda rewanî: .........., bîrdozî, ........, ol û hwd.**

**Çanda ...........: avahî, çandinî, .........., cil û berg, ......... û hwd.**

**Wane 2**

## Sinc çi ye?

Mirov bi serê xwe nabe mirov û nikare bijî . Fîzîk (biyolojî), hizir, hest, behre, hiş û hemû taybetiyên mirov, ancex di nava civakê de bi pêş bikevin. Kesayet bi awayekî giştî, di nava jiyana civakî de, çêdibe.

Baş e, gelo mirov çawa û li gorî çi dibe civakî?

Ancex li gorî pîvanên civakî û di nava civakê de, bibe civakî.

Li vê derê girîngiya sinc derdikeve holê; sinc dihêle mirov ji aliyê civakê ve bê pejirandin û bibe endamê wê.

**Sinc: Pîvan û rêgez in ku ji aliyê civakê ve hatine diyarkirin.**

**Sinc:** Bingehê hebûn û berdewamiya civakê ye û rê nade ku civakbûn û mirovbûn têk biçin. Nîhad (wijdan), hezkirin, rûmet, dostanî, keddayîn, hevaltî, piştgirî, alîkarî, rêzgirtin, başî, rastî, û gelek nirxên din ên di nava jiyana civakî de hene, "dikevin nava çarçoveya sincî" de. Dema mirov xwedî li wan nirxan derdikeve, ji



xwe re bingeh digire, dike şêwaza jiyana xwe û ancex dikare di nava civakê de bijî. Nexwe, civak wî/ê ji nava xwe derdixe. Ger em bibêjin mirov bê civak nikare bijî, ew tê wateya ku sinc jî, di heman demê de pîvana mirovbûnê ye. Dema mirov ji sinc dûr bikeve, ji mirovbûna xwe jî, dûr dikeve. Di derbarê pênase û peydabûna sinc de nêrînên cur bi cur hene, lê belê di bingehê de hemû pênase li gorî du çavkaniyan tên pênasekirin.

**Çavkaniya Yekem:**

Hêzên demokratîk û civakî:

Dema pêvajoya mirovbûn û civakbûnê dest pê kir, sinc jî derket holê. Ango, li ser bingehekî sincî, civak derket holê û heta niha jî, bi rêya sinc xwe didomîne. Nirx û pîvanên sinc ji aliyê hêzeke desthilatdar, dewlet û hêzên din ên derveyî civakê ve nayên diyarkirin, li pêş xistin û parastin.

**Çavkaniya Duyem:**

Nêzîkatiya hêzên desthilatdar û dewletî:


Li gorî xwe, pênaseyeke sincî dikin, lê belê pênaseyeke şaş e. Weke her tiştî dixwazin sinc jî şaş û lewaz bikin û bixin di bin xizmeta xwe de. Ji ber vê yekê, naxwazin sinc bi giştî bê fêmkirin. Wateya sinc parçe dikin, teng dikin û li gorî berjewendiyên xwe bi kar tînin.

**Mînak:** Peyvên tirs, rêzgirtin, tawan, seza û neçartiyê zêde bi kar tînin. Sinc, tenê di nava sînorên olê de dinirxînin. Hêzên dewletperest, desthilatdar û dagirker xwe li ser dijminatiya sinc ava kirine. Her wiha ji bo desthilatdariya xwe bidomînin, xwe bi hêz bikin, êrîşî sinc, nirx û pîvanên sincî dikin. Piştî dewlet

derket holê û bi şûn de jî, civakê ji bo parastina sincê xwe, bê navber têkoşîn kiriye.

Zerdeşt  bi gotina xwe ya :

**"Rast bihizire, xweş biaxive û baş pêk bîne."**



Di bingeh de sincê civakê parastiye. Kesayetên weke: Zerdeşt, Bûda, Sokrates, Manî, Şêx Bedredîn, Pîr Sultan Abdal, Nietzche (nîtşê) û Adorno... Ji bo sincê civakê hewil dane, ked dane û têkoşiyane. Asta jîrbûn û xweşikbûna mirovan, bingehê avakirina civakbûnê pêk tîne.

Di vê wateyê de em dikarin bibêjin ku di avakirina civakbûnê de, azadî hêza avakirinê ye. Em dikarin jiyana bisinc û azad di nêzîkatiyên civaka xwezayî de, bibînin. Ev jî tê wateya ku civakeke sincî, bi azadiyê gengaz e. Ya rast azadî bingehê sinc e. Di heman demê de em dikarin bibêjin ku sinc nîhadê (wijdanê) civakê ye.

## Pirsên Nirxandinê:

1. Sinc çi ye û çi dikeve bin siya wî?
2. Çavkaniyên ku sinc pênase dikin, çi ne? Yekê şîrove bike.
3. Sincê civaka xwe binirxîne û bi hevalên xwe re parve bike.

**Wane 3**

# Çêbûn û pêşketina çandê

Mirov bê civakbûnê nikare bijî. Dema mirovahiyê ev rastî dît, civakbûna xwe bi pêş xist. Çawa mirov bê civakbûn nikare bijî, civak jî bê çand, nikare hebûna xwe misoger bike. Lewma jî, civakbûn çanda mirovahiyê ye.

Di dîrokê de pêşketinên ku di civakê de çêbûne, di heman demê de pêşketinên çandê ne.

- Çandbûn di destpêkê de, ji ber pêwîstiyên neçarî yên xwarin, vexwarin, xwezêdekirin û xweparastinê, bi pêş ketiye.

- Çanda mirovan a destpêkê ji bo xwetêrkirinê bi komkirina giya û nêçîrvaniya lawiran dest pê dike. Bi demê re hizra mirov jî, bi pêş dikeve û her gava mirov diavêje, di mirovan de hêzekê çêdike. Ev gav jî dibe sedema ku civakbûn bi pêş bikeve.




XIRAB REŞK



ŞIKEFTA ŞANÎDARÊ

Bi kurtasî, mirov çiqasî çanda xwe çêdike, ewqasî civakîbûna xwe li pêş dixe. Çi qas civaka xwe li pêş dixe, ewqas jî, çanda xwe ava dike.

Bi vî awayî, mirov her ku diçe xwe ji lawiran cuda dike. Ji ber ku tiştên mirov ji lawiran cuda dike û bi wan dibe mirov, berhemên wî yên çandî ne. Çand bi destên mirovan çêdibe, li pêş dikeve, tê guhertin û ji nifşekî derbasî nifşekî din dibe.




NASKIRINA AGIR

Mirovan bi civakbûnê hêza xwe kirin yek û tengasî derbas kirin. Di derbaskirina van tengasiyan de, em ji keda ku hatiye dayîn re dibêjin **çand**. Pêşketina ku di çandê de çêbûye, keda hezarê salan û milyonê mirovan e. Di pêvajoya mirovbûn û civakbûnê de, pevretevgerkirin, hevgirtin, alîkariya hev û bihevşêwirîn e. Ev têgeh, di jiyana wan de xalên sereke ne.

Eger ev taybetî û nûbûna mirovan nebûna, wê nikarîbûna weke mirov xwe li hemberî mercên heyî biparastana û wê nikarîbûna jiyana xwe bidomandana. Lewma di dîroka mirovahiyê de, ji çanda bingehîn re çanda civaka komînal û demokratîk, tê gotin. Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin mirov bi civakbûn û şêwaza civakbûna komînal, dikare wateyê bigire.

## Pirsên Nirxandinê

**1-** Çima mirov bi tena xwe nikare bijî?

**2-** Mirovan çawa tengasî derbas kirine?

**3-** Valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagire:

**A.** Mirov çi qas ……. çêdike, ew qas jî …….. xwe li pêş dixe.

**B.** Mirovan bi ……..ê hêza xwe kir yek û …… derbas kirin.

**Wane 4**

## Sinc û rêgezên wî






Rêgezên sincî hêmanên bingehîn ên jiyana mirovan e. Ev rêgez, ji pîvan û destûrên nivîskî û nenivîskî pêk tên. Jiyana çi civaka bêrêgez, dê bibe hewdeleke bêdawî ku her kes dest û lingên xwe ji hev dernexe. Gerdûn û hemû zindiyên li ser rûyê Cîhanê bi rêgezeke bêhempa û rêxstinkirî, bi hev re tev digerin. Di cihana mirovan de, her civakekê li gorî xwe rêgezên jiyana xwe afirandiye. Bi demê re dibe ku rêgez bibin zagon û bên nivîsandin û li ser hemû kesên di civakê de bikar bên. Yê ji derveyî wan rêgezan derkeve di nava civaka xwe de nayê pejirandin. Lê zagon bi xwe nakok in, ji xwe ji aliyê dewlet û

desthilatdariyê ve, ev zagon ji bo pêkanîna berjewendiyên serdestan tên nivîsîn.

**Mînak:** Turkiyeyê, ku ew gelek peymanên zagonan îmze kiriye, lê dema mijar dibe azadî, demokrasî, kurd û çalakvanên wan, ji nişkêve zagon pûç dibin. Her wiha gelek mînakên van dewlet û zagonên wan hene. Hin caran rêgezên sinc bûne zagon û derbasî nava nifşê civakê yê nû bûne; tevî ku ev zagon berya wê ji rêgezê sinc bûn ku civakê bikar tanî, lê nifşê nû napejirîne. Nifşê nû dibin bandora kaptelîzimê de ne, ji ber vê yekê ji berdewamiya sincê civakê dûr dikevin.

**Mînak:** Erka xweparastinê, her civak ji boy ku jiyana xwe bidomîne pêwîst e xwe biparêze, xwe têr bike, xwe zêde bike û xwe li pêş bixe. Rêgezên sinc ên civakê encama keda mirovan a bi hezarên salan e, bi hêsanî mirov nikare xwe dûrî sinc û rêgezên wê bibîne.  Wê demê ew dûrî civakê jî dikeve, rêgezên sinc ev in: Rêzgirtin, berpirsyarî, hezkirin, azadî û hwd.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Rêgezên sinc ên civaka xwe, lêkolîn bike?

2- Bi çi awayî pêwîst e rêgezên sinc bibin zagon?

3- Zagonên dewletan li gorî çi û kê tên avakirin?

# BEŞA DUYEM: DI DÎROKÊ DE ÇAND Û SINC

1- Çand û sinc di civaka xwezayî de
2- Pêşketina çand û sinc di serdema kevirî ya nû de
3- Çand û sinc di şaristaniyê de
4- Çand û sincê nûjen



**Wane 1**

## Çand û sinc di civaka xwezayî de

**Civaka xwezayî:** Li gorî lêkolîneran, tê texmînkirin ku beriya Serdema Qeşayî, komên civakî bi rengekî azad û wekhev jiyan e. Ji van koman re (klan) tê gotin. Hejmara endamên klanê (20- 50) bû. Her endam di klanê de bi erkên cuda radibe. Di



klanê de karê jin û mêr ji hev ne cuda bû; her kes bi parastin, nêçîrvanî, bijîşkî, perwerde, erk û berpirsyariyên xwe yên girêdayî sincê civakê, radibû.

Mirov jiyana xwe bi awayê klanê dest pê kiriye û her tişt li derdora xwe zindî dîtiye. Ji vê gavê re jî (Anîmîzm) tê gotin. Mirov weke xwe li xweza û derdora xwe dinêre. Awayê civaka klanî 98 ji sedî ji jiyana mirovahiyê dirêj kiriye. Tevî vê dîroka dirêj jî, em dikarin bibêjin ku mirov bi awayekî komînal jiyaye. Awayê komînal tê wateya her kes ji bo civakê û civak jî ji bo her kesî/ê dixebite û kar dike. Mirov xwe ji erkên peydakirina pêwîstiyên berdewamiya jiyana klanê, dûr naxe. Erkên peydakirina pêwîstiyên klanê, dibe çandek di nava endamên klanê de. Dûrbûna ji erkên ku bûne çanda klanê, dibe karekî

nesincî. Klan wê demê, bi çavekî ne baş li endamên ku bi erkên xwe ranabin, dinêre û wan siza dike (wan demekê ji klanê dûr dixe).

Hemû zanistên ku di klanê de têne afirandin, dibin rêgezên sincî yên wê klanê. Mînak: Çêkirina amûrên nêçîrvaniyê û li hev kombûna civakê ji bo derbaskirina zor û zehmetiyên jiyanê. Mirov ne bi hêsanî ev qonax derbas kiriye, gelek zehmetî dîtiye û li hemberî van zehmetiyan yekbûna klanê ji xwe re bingeh girtiye.

## Pirsên Nirxandinê:

**1.** Klanê pênase bike?

**2.** Ji jiyana mirovahiyê klanê çi qasî dirêj kiriye û bi çi awayî jiyaye?

**3.** Bersiva rast bi tîpa (R) û ya şaş bi tîpa (Ş) nîşan bike:

**A.** Hejmara endamên klanê ji (10-20) kesî pêk dihat. ( )


**B.** Mirovê ku bi erkê xwe ranebe, mirovekî bisinc e. ( )

**Wane 2**

## Pêşketina çand û sinc di Serdema Kevirî ya Nû de

Serdema Kevirî ya Nû, cara yekem li Mezopotamyaya jorîn li quntara çiyayê Toros û Zagrosê di navbera çemê Dicle û Feratê de, hatiye pêşxistin.

Bingehê vê çandê, çanda kurdan e. Di destpêkê de em dikarin bibêjin, cihê ku jê re Mezopotamiya tê gotin, şert û mercên avhewayê ji bo jiyanê guncaw in.




Li ser vê xaka dewlemend, çandinî, jiyana hevpar, rêgezên jiyanê, bawerî, çand û sinc ava kirine. Ji bo çandiniyê axa biberhem, kedîkirina lawiran û ji bo xweparastinê jî, guncaw in. Bi vî awayî têkiliya di navbera çand û axê de jî, xurt dibe. Ji ber ku her çand li ser axekê çêdibe û ev çand di bingehê sincê civakê de cih digire. Ax jî di avakirina hêmana çand û rêgezên sincî de

bingehekî sereke ye. Çand û sincê civaka Serdema Kevirî Ya Nû, şoreşa gund û çandiniyê li pêş xistiye. Çand û sincê civaka Serdema Kevirî ya Nû ya ku muhra xwe li dîrokê xistiye, şaxê reseniya xwe di herêma Kurdistanê de belav kiriye. Lewma em dikarin bibêjin ku avakirina gundan û pêşxistina çandiniyê di bingehê xwe de çand û sincê kurdan ê resen e û piştre di cîhanê de bûye. Kurdan çanda çandinî û gundewariyê pêşkêşî mirovahiyê kiriye. Di Serdema Kevirî ya Nû de, çêkirina xaniyan, çandiniya tovan, avdanî, parvekirin, comerdî, pîrozkirina cejinan, cîrantî, vedîtina demsalan, bijîşkî, lawirvanî û hwd, bi pêşengtiya dayikê bi pêş ketiye û sazûmaniya bingehê jiyana hevpar a civakî hatiye avakirin.

## Pirsên Nirxandinê:

**1.** Bersiva rast hilbijêre:

A. Serdema Kevirî ya Nû, cara yekem li Mezopotamyaya jorîn li quntara Çiyayê Toros û Zagrosê:

**a.** Di navbera Çemên Dicle û Feratê de, hatiye pêşxistin.

**b.** Di rojhilatê Çemê Dicleyê de, hatiye pêşxistin.

**c.** Di rojavayê Çemê Feratê de, hatiye pêşxistin.

**Wane 3**

## Çand û sinc di şaristaniyê de

Weke hemû rastiyên heyberî, ji bo ku mirov bikare jiyana xwe bidomîne, têkoşîna heyînê kiriye. Weke hemû zindiyan, mirovan xwetêrkirine, xweparastine, xwezêdekirine û bi demê re ango bi pêşketina hiş re, xwe û jiyana xwe bi wate kirine. Wek ku tê nasîn dîroka desthilatdariyê ji Sumeran dest pê kiriye. Sumer (Hev kombûna çanda Aryen û Samitîk e), di encamê de çanda Samitîk dibe serwer û civakê bi rêya rahiban dixe bin destê xwe. Sumer (4000-3500) B.Z dest pê kirbû, dîroka desthilatdarî û dewletê ji Sumeran dest pê kiriye. Ev dîrok ji sedî 2 ji dîroka mirovahiyê ye.


**Li ser rûyê erdê zindiyê herî afirîner ê ku ji yekbûna têkiliyan re vekirî ye, mirov e.**



ZÎGORAT

Lewma çand û sincê mirovahiyê, gelekî dewlemend in. Dewlemendiya çand û sincê mirov di hezarê ziman û zaravayên cur bi cur de, di ramanên olî yên cuda cuda de, dîsa di berhemên dîrokî û hunerî de tê dîtin. Lê dema ku di civaka mirov de bi destên desthilatdaran, pergala desthilatdarî, çînîtî û

dewlet li pêş ket, çanda mirovahiyê lawaz bû. Bi gotineke din, em dikarin bibêjin ku di serdema desthilatdarî û dewletê de, bêhtir bêçandbûn û dûrbûna ji sinc derketiye holê. Di qonaxa pergala desthilatdar û dewletê de karê bingehîn şer, pişaftina çandan, bêmafî, stemkarî, wêrankirin, qedexe-kirina zimanan, mirov bi darê zorê ji cih û warê wan derxistin, dagirkirin û hwd.



DAYÎKA XWEDAWEND

Pergala ku bi destê zilamên serdest bûye desthilat, civak xirab kiriye û cudahî xistiye di navbera jin û mêr de. Di Serdema Kevirî ya Nû de hemû mirovan bi hev re weke hev jiyane. Hîn jî em vê yekê di jiyana xwe ya rojane de dibînin.

**Mînak:** Di cejinan de serdan, parvekirina êşan, alîkarîdanyîn, rêzgirtina ji dê û bav re û hwd.

Di pergala desthilatdarî û dewletê de, sê qonax derbas dibin:

1. **Qonaxa kole û koledaran.**
2. **Qonaxa begitî û xulamtiyê.**
3. **Qonaxa sermayedarî û karkeriyê.**

- Li ser van qonaxan lêkolîn bikin.

## Pirsên Nirxandinê:

1. Şaristanî û dewlet ji ku dest pê kiriye?
2. karê bingehîn ê desthilatdar û dewletê çi ye?
3. Valahiyên li jêr bi gotinên guncaw dagire:

A. Sumer (Hev kombûna çanda ……. û ……. e)

B. Li ser rûyê Erdê ............ herî afirîner ê ku ji ............. têkiliyan re vekirî ye, ........... e.

## Sumer

Di bingeha xwe de li ser bazirganiyê hatiye avakirin. Bazirgaiyê, gelên çiyayî (Aryen) û gelên biyabanê çanda Elubeyd (Samitîk), gihandiye hev. Lê bazirganî, nebûye bingehê desthilatdariyê; ji ber ku her du çandan gelek hevguherîn bi hev re çêkirine û ev nêzî 2000 salî dirêj kiriye. Desthilatdarî bi armanca destdayîna li ser berhemên zêde, derket holê.



**Wane 4**

# Çand û sincê nûjen

Di roja me ya îro de, pir zehmet e ku em li ser çand û sinc biaxivin. Dema em li ser çand û sinc diaxivin, pirseke wiha xwe dide pêş.

- Gelo em di aloziya nirxan de, yan jî di nirxên nû de dijîn?

Nirx bi rengekî giştî ji çand û sincê civakan çêdibin. Em civakan bi rêya nirxan nas dikin.

Serdema nûjen ya ku em tê de dijîn, hin nirxên binghîn (bedewbûn, hezkirin, alîkarî û hwd) paşguh dike.

Li şûna nirxên xwezayî nirxên dewletan li pêş dixe; her dewletek bi aborî û diravên xwe wek nûjeniyê xwe nîşan dide.

- Gelo heta kîjan astê em dikarin bibêjin ku despêka sedsala 21`ê, destpêka aloziya nirxan ne û bi taybet nirxên mirovahiyê?

Mirov wek hemû zindiyên di xwezayê de, di nava pirsgirêk û aloziyan de dijî. Dibe ku ev alozî, hin aloziyên nû jî derxe holê.




Nirx weke teybetiyeke mirovahiyê ye, mirovan ji zindiyên din cuda dike. Dema ku civak ji pirsgirêkên xwe re çareyê nebîne, aloziya nirxan derdikeve pêş.

Mirov di dema nûjen de bi lez bandor dibe, ev amûr guherînan di reftarê mirov de çêdike.

Bi vî aweyî nirx di nêrîna me de dibe gerdûnî, bê çand, sinc, ol û bawerî dimîne. Taybetiya civakîbûnê ji holê radike.

- Gelo ev pêşketina di nirxan de, çi qeyranan derdixe holê? Bi rêya amûrên pêşketî (twitter, facebook, whats app û hwd) hin girûpên ku li dijî nirxan (ol, sinc, çand û hwd) derdikevin û daxwaza mirina nirxên kevin dikin, hene.
  Eger em bi rêya perwerdeyê çareyekê ji vê pirsgirêkê re nebînin, em dê çand û sincê xwe jî winda bikin.
  Çand û sincên biyanî ji civaka me re nabin derman; her çandek bi nirxên girêdayî erdinîgarî, bawerî, hişmendî û ziman ve tê avakirin.

Pêşketina teknîkê li cîhanê, demê kurt dike û bilez hevdîtinê çêdike. Ya herî baş ew e ku em vê teknîkê ji bo pêşketina xwe û civaka xwe bi kar bînin. Rast e hin amûrên ragihandinê ji bo ku mirovan ji çand û sincê wan dûr bixin û wan bi pergala kapîtalîzimê ve girê bidin, çêbûne. Lê mirov bi hişmendiya xwe ya civakî dikare vê bîrdoziya kapîtalîzmê, li bin bixe.



## Pirsên Nirxandinê:

1- Civaka me ya îro li ser çi bingehî dijî? Lêkolîn bike.

2- Pergala kapîtalîst, civakê çawa bi rê ve dibe? Lêkolîn bike.

3- Pêwîst e em çawa bijîn? Ramanên xwe diyar bike.

## BEŞA SÊYEM: ÇAND Û CIVAK

1- Têkiliyên mirov û civakê

2- Têkiliyên di navbera çand û ziman de

3- Nasnameya çandî -1

4- Nasnameya çandî -2

5- Nêzîkatiyên me li hemberî derdor û giyaneweran



**Wane 1**

# Têkiliyên mirov û civakê

Avakirina kesayeta mirov ji zarokatiyê dest pê dike. Dema zarokek, ji dayîk dibe, heta mezin dibe, taybetiyên xwe ji dayîk, bav, endamên malbat û ji derdorê digire. Ji xwarinê heta rûniştinê, şêweyê axaftin, danûstandin, nêrîn û daxwazê, bandoreke mezin li ser avakirina kesayetê dike.



Di rastiya xwe de, mirov nasnameya xwe ya civakî bi çanda xwe vedibêje. Ev dibe cudabûna mirovan ji hev û du. Mirov çi qas bi çand, kevneşopî, dîrok û zimanê xwe ve girêdayî be û bi wan tev bigere, dikare rastir bijî.

Ev pêşeroj bi çandeke durist bi ser dikeve. Mirov bingehê çanda xwe ji zaroktî heta mezinatiya xwe digire, lê bi giranî,

taybetiyên xwe yên herî bibandor, ji dema zarokatiya xwe heta ciwantiya xwe digire.

Taybetiyên di avakirina kesayetê de bibandor nirxên civakî, ramyarî, bawerî, çand û sincê xwe ve di dema civakbûnê de digire.

Ji bo ku mirov fêrî jiyana civakî bibe, pir hêman hene. Ji wan hêmanan, ên herî zêde civakabûnê bi pêş dixin û bandora erênî û neyînî li kesayata mirov dikin: malbat, heval, pergala perwerde û ragihandinê û hwd e.

**Mirovên bêçand, mirovên bêkok in. Ji ber vê yekê, çanda ku mirov digire, dibe pêşeroja mirov.**

Ji destpêka çêbûna mirov, girêdana wî bi civakê re çêdibe. Civakên xwedîçand bi hemû awayî hewl didin ku mirovan li pêş bixin. Nêzîkatiya mirov ji xweza, derdor, malbat û hwd, bandora civakê, diyar dikin.



Dibe ku civak bi awayekî erênî yan jî neynî bandora xwe li kesayetên civakî bike. Her wiha dibe ku mirov jî kêm carnan ji awayê civaka xwe cuda be, ev yek jî dema ku civak ji cewherê xwe hatibe dûrxistin, pêk tê.

Wek ku her kes dizane, mirov zindiyeke ku bi tena serê xwe nikare bijî; ji ber vê yekê, civakbûn girîng e. Her wiha mirov jî dema ku bi erkê xwe yê civakî radibe, bandorê li civakê dike. Civak bê mirov nabe civak, mirov jî bê çand nabe xwedî nasnameyeke civakî.

## Pirsên Nirxandinê:

**1-** Mirov bi rêya çi, xwe ava dike?

**2-** Bandora civakê di avakirina kesayeteke çandî de, lêkolîn bike.

**3-** Valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagire:

**A.** Avakirina ........ mirov ji ................. dest pê dike.

**B.** Taybetiyên di avakirina kesayetê de bi bandor ....... civakî, ramyarî, ........, çand û sincê xwe di dema ............ de digire.

**Wane 2**

## Têkiliyên di navbera dand û ziman de

Ziman, hîmê bingehîn ê çandê ye. Çand, piranî bi rêya ziman, xwe dewlemend dike. Ziman ji bo mirov, nasnameya çand û nirxên civakê ye. Çand, bi rêya ziman tê berdewamkirin û li pêş xistin. Di jiyana civakî û fêrkirina ziman de, dayîk rola bingehîn dilîze, lewma ji zimanê her civakê re "**zimanê dayîkê**" tê gotin. Bi kurtasî, **çand û ziman weke goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne.**


### Rojekê ji Konfuçyûs pirsîn:

"Ger ji bo rêvebirina welatekî, gazî te bikin, tu dê çi bikî?"

Bersiva wî jî wiha bû: "Min dê di destpêkê de zimanê wan sererast bikira."Ji ber ku dema zimanê civakekê xerab be, ew civak nayê fêmkirin û dê nikaribe hizir û ramanên xwe bide diyarkirin.



Dema hizirandin baş nayê bilêvkirin, wê demê kar rast nayê pêkanîn. Dema kar û erkên ku tên xwestin pêk neyên, wê demê rêxistina wê civakê xirab dibe. Dema wekhevî têk diçe, di nava gel de tevlihevî çêdibe. Ji bo vê jî, tu tişt bi qasî ziman girîng tune ye.



Em çi qas zimanê xwe rast bi kar bînin û dewlemend bikin, ew qas em dê bikarin çanda civak û netewa xwe dewlemend bikin û derbasî nifşên nû bikin.

Di cîhana me de, gelek ziman hene û her zimanek girêdayî çandekê ye.

(Aryen, Samîtîk, Ural Altay, Çînî Tîbît, Buantû) ev çand in ku her zimanek koka xwe jê digire.

**Konfuçyûs:** (551 - 479 B.Z) Yekemîn feylesofê Çînî, felsefeyek li ser nirxên sincî ava kiribû.

## Pirsên Nirxandinê

**1.** Çima ji zimanê mirov re zimanê dayîkê tê gotin?

**2.** Hevokên rast bi (R) û yên şaş bi (Ş) nîşan bike:

**a.** Ziman, çandê dewlemend dike. ( )

**b.** Çand û ziman wek goşt û neynûkê ne. ( )

**c.** Ziman hîmê bingehîn ê çandê ye. ( )

**Wane 3**

## Nasnameya çandî 1

**Malbat:** Gava yekem a jiyana kes, di nava malbatê de dest pê dike. Bingehê zanist û baweriyên yekem, malbat ava dike. Têkiliyên endamên malbatê bi derdorê re, şêweyê jiyana dayîk û bav, bandoreke mezin li ser avakirina kesayeta zarokan (erênî - neyênî), çêdike. Bingehê kesayetê li vê derê tê danîn. Pêwîst e malbat pêwîstiyên zarokên xwe yên heyberî û rewanî li gorî mercên jiyanê pêşkêş bike û bikare bibe bersiva hemû pirs, nêrîn û daxwazên wan.



Di perwerdekirina zarokan de, çawa rabe, rûnê û çawa biaxive, di asta yekem de, malbat berpirsyar e.

Di malbatê de hêza herî bingehîn, mirovên herî bi bandor in. Di roja me ya îro de, dibe ku çanda malbatê têra fêrbûnên rast neke û aliyên wê yên kêmayî jî hebin. Ji ber ku malbatên me di nava çanda pergalên desthilatar de, hatine pişaftin û guhertin.

Malbat û endamên malbatê di bin bandora pergala desthilatdariyê de hatine hiştin. Di gelek deveran de hatiye

xwestin ku malbat, çand û kevneşopiyên xwe yên dîrokî ji bîr bikin. Ji ber van sedeman, divê em çanda xwe ya dîrokî baş bizanin. Bi çanda ku di nava malbatê de tê jiyîn, bînin cem hev û berhev bikin, aliyên wê yên rast ji bo pêşeroja xwe, bingeh bigirin.

**Gelo çanda rast ji bo mirov, divê çawa were zanîn?**



Malbatên xwedî nirx û zana bandoreke erênî li kesayeta zarokên xwe dikin. Hest, raman, bawerî, welatparêzî, hezkirin, rêzgirtin, jiyana hevpar û nirxên civakî, di malbatên xwedî nirx û zana de tên avakirin.

Malbat, ne tenê cihê têkiliyên dê û bav e. Malbat , cihê perwerdekirin û avakirina kesayeta zarok e. Ev li gorî çand û sincê civakê , dibe bingehê avakirina civakê.

Ji bo ku endamên civakê yên bisinc, wek hev û azad bêne avakirin, divê di nava malbatê de ev pîvan werin rûniştin. Bi pêşxistina van pîvanan, malbatên wek hev û demokrat tên avakirin.

Di nava malbatê de ji bo wekhevî bi pêş bikeve, divê di serî de rewşa jinê ya bindestiyê ji holê rabe.

Ev ne tenê bi rewşa dayîkê ve, rewşa zarokên keç û kur jî di nav de, divê li ser hemû beşên civak û çanda desthilat ku hatiye avakirin, were sekinandin û di veguherînên pir mezin re derbas bibe.

**Çanda desthilatê:** Çanda ku di roja me de civakê xirab dike, kesan ji civakê qut dike û rê li ber şer û pevçûnan vedike.

## Pirsên Nirxandinê:

1. Çi, li ser avakirina kesayeta zarokan (erênî-neyînî) bandoreke mezin çêdike?
2. Malbata wekhev û demokrat, çawa tê avakirin?
3. Rola çanda desthilatê di civakê de, çi ye?
4. Bi kurtasî rewşa çanda malbata xwe binvîse.

**Wane 4**

## Nasnameya Çandî 2

**Derdorên Civakî:** Di avakirina kesayet û girtina çandê de, piştî malbatê gava duyem, têkiliyên bi derdorê re tên. Mirov bi endamên civakê re dikeve nava danûstandinan. Gelek caran hinek tişt biyanî ne û pejirandina hinek nêzîkatiyan jî bi xwe re tîne. Danûstandina bi derdor re û hevaltiyên di vê demê de, bandorê li kesayeta mirov dike. Perwerdeya ku mirov di gava yekem de digire ji bo gava duyem bingeh e.



Bi demê re bersiva van pirsan di nava komên hevaltî û nasîna derdorê de li pêş dikeve. Çawa ku mirov di malbatê de çand û sincê xwe digire û bi vê çandê mezin dibe, di heman demê de gelek taybetiyên çandî jî, ji derdora xwe digire. Derdora civakî bi awayekî nerm bandorê li hişmendiya mirov dike. Mirov bi têkiliya xwe ya bi civakê re nasnameya xwe ya civakî ava dike.

Nasnameya mirov girêdayî nasnameya civaka wî/ê ye. Civak nasnameya mirovan diyar dike.

**Perwerde:** Pêwîst e mirov di perwerdeya dibistanan de, bibe xwedî zanistên nû. Her wiha ji bo avakirina kesayet, nirxên civak û welatê xwe, divê girîngiya zanistê nas bike. Di kesayetê de nûbûn xwe ava dike. Xweplankirin û tevgera biarmanc bi perwerdeyê tê li pêş xistin. Lê belê di dibistanên dewletan de, armanca perwerdeyê cuda ye.



Perwerdeyên ku dewlet, ango hêzên desthilatdar ava dikin, piraniya wan li ser berjewendiyên desthilatdaran tên sazûmankirin. Ji ber vê dibistan di rêza sereke de ye.

Dema ku pergala dewlet û desthilatdariyê hat avakirin û xwestin xwe bikin hêz, di serî de dest avêtin hêza ciwanan. Bi taybetî bi rêya ciwanan hewl didin ku çand û sincê civakê xirab bikin. Hêzên ku li ser keda mirovan desthilatiya xwe ava kirine , di roja me de jî, heman rêbazan bi kar tînin.

Bi rêya pergala perwerdeya dibistanan, li hişmendiya zarok û ciwanan bandorê dike, ji netew çand û sinc û zimanê civaka xwe, dûr dikevin. Pergala dibistanan a bi vî şêweyî, pergalên dewletî ne(hişmendiya dewletê).

## Pirsên Nirxandinê:

**1.** Derdorên civakî, çi bandorê li kesayeta mirov dike?

**2.** Pêwîst e mirov li dibistanê fêrî çi bibe?

**3.** Hevokên rast bi (R) û yên şaş bi (Ş) nîşan bike:

**A.** Nasnameya mirov girêdayî nasnameya civaka wî/ê ye. ( )

**B.** Derdora civakî bi awayekî nerm bandorê li mirovan dike. ( )

**C.** Civak nasnameya mirovan diyar nake. ( )

**Ç.** Dibistanên desthilatdaran, mirovan li pêş dixe. ( )

**Wane 5**

## Nêzîkatiyên li hemberî derdor û giyanweran

Di kesayeta mirovan de her taybetî û nêzîkatî asta mirovan diyar dikin. Kesayetên baş û xwedî pîvanên sincî, nêzîkatiyên wan ên bi derdorê re jî, sincî ne. Li ser van bingehan, divê weke rêgezeke sereke, derdor were paqijkirin û parastin.

Paqijiya derdor, parastina ajal û şînatiyan, çandinî û bikaranîna axê bi awayekî rast, erkên sereke ne. Pêwîst e, av bi awayekî paqij were bikaranîn û şînatî bêserûber neyên birîn.

Di dema derketina çand û sincên civakî de û bi taybet dema dîrok tê lêkolînkirin, tê dîtin ku di hemû çavkaniyên çand û sincî de ev rêgez hene. Ev rêgez ji ber ku nehatine parastin, di roja me ya îro de xweza gelekî





hatiye xerabkirin û her ku diçe bêtir ber bi xerabûnê ve diçe. Demsal hatine guhertin. Di hinek deveran de ba û baran zêdetir bûne, li hinek deveran jî, germahî zêdetir bûye. Ev jî dide xuyakirin ku hevsengiya jîngehî xirab bûye. Gelek gazên

kîmyayî hatine bikaranîn û tên bikaranîn. Ev jî bûye sedama tenikbûna qata (tebeqeya) Ozonê..

Pêwîst e em karbin dîsa xwezaya xwe ya dewlemend vegerînin, biparêzin û pêdiviyên wê pêk bînin. Ger ev neyên pêkanîn, wê xwezayeke ku em karbin bi çand û sincê xwe tê de bijîn jî, peyda nebe. Bi qasî ku kes li rêgezên malbatê xwedî derdikeve, berpirsyar e, ewqasî jî, li hemberî derdora xwe berpirsyar be. Mirov çi qas peywendiyên xwe bi derdora xwe re bihêz bike û fêm bike, dikare di jiyana xwe de ewqas serkeftî be. Di nava zindiyan de, yê ku bikare çavdêrî û alîkarêya derdora xwe bike, mirov e.

Mirov, bi van taybetiyên xwe dikare derdora xwe paqijtir bike, daran biçîne, şînatiyê biparêze û rêzê bide derdora xwe. Divê zanibe ku ew jî zindî ne, kêfxweş dibin, diêşin, û pêdiviyên wan jî, hene. Mirovên ku ji derdora xwe hez bikin û pêdiviyên wê pêk bînin, dikarin jiyaneke biwate bidomînin.



Yek ji taybetiyên çanda mirovbûnê jî, paqijî ye. Her mirov berpirsyarê paqijiya beden û derdora xwe ye. Biqasî ku mirov paqijiya xwe bike, divê derdora xwe jî, paqij bike û xwezayê jî, paqij bihêle. Di roja me de gelek bûyerên weke qirêjbûna hewa

û ava vexwarinê û nexweşiyên ku bi sedema wan çêdibin, ji ber qirêjiya xwezayê pêk tên. Mirov bi vê kêmzanebûna çanda paqijiyê, di roja îro de hêdî hêdî dawiya xwe tînin.

## Pirsên Nirxandinê:

**1.** Giringiya derdor û geyanweran, diyar bike.

**2.** Bi xerabkirina derdorê re çi derdikive holê?

**3.** Valahiyên li jêr dagire.

**A.** Di kesayeta mirovan de her ............. û .............asta mirovan .........................

**B.** Gelek ...............ku diqewimin, ji ber nêzîkatiyên ........û girîngî nedane............. , çêdibin

# BEŞA ÇAREM: RÊGEZÊN SINC

**Rêzgirtin**

**A. Rêzgirtina nirxên civakî.**

**B. Rêzgirtin û pêkanîna rêgezên hevpar ên civakî.**

**C. Rêzgirtina baweriyên civakî.**

**D. Rêzdariya mirov li hemberî kevneşopî û fêrbûnên civakî.**

**Hezkirin -1**

**Hezkirin -2**

**Hezkirin -3**

**Berprsiyarî**

**A. Berpirsiyariya mirov û civakê**
**B. Di civakê de bêmafî û mafdayîn**



**Wane 1**

# Rêzgirtin

Hişmendiya rêzgirtinê, rêgezeke bingehîn a sincî ye. Ji bo mirov karibe rêzgirtinê di xwe de ava bike, pêwîst e berî her tiştî xwe zana bike û weke rêgezekê, rêzdayîn û rêzgirtinê, di xwe de ava dike. Mirov bi qasî ku rêzê dide xwe, pêwîst e ewqasî rêzê bide derdor û civaka xwe jî.

Mirovên ku rêzgirtinê di xwe de ava nekin, ji hemû nirxên xwe yên civakî û dîrokî dûr dikevin. Pêwîst e mirov hemû mafên xwe yên jiyanî û mirovane nas bike û bipirse ka ji ku derê hatine.

Dîrok û kokên xwe nas bikin û ji bo mafên mirovan tê bikoşin. Qasî ku daxwaz û doza mafê xwe dikin, divê ewqasî mafê jiyan û wekheviyê ji derdora xwe re jî, nas bikin û bixwazin.

Mirovên bêvîn (kole), ji dîrok û kokên xwe dûr in, xizmeta dijminê xwe dikin û nayên hezkirin, ji mirovên wiha re rêz nayê girtin. Mirovên rêzgirtinê di kesayeta xwe de ava dikin, mirovên xwedî sinc û çand in.

Rêzgirtin, nasnameya civaka sincî ye. Li hemberî her mirovî bê ku cudahiya çand, ziman, nijad û reng bê kirin, nêzîkatiyên mirovbûnê raber kirine. Ji xwe ji raman, çand, sinc, dîrok, civak, hebûna xweza û ajalan re rêzgirtin pêwîst e. Mirovên xwedîçand û sincekî rast dikarin ji van nirxan hemûyan re rêzê bigirin. Ev jî, taybetiya mirovên zana ne. Mirovên bêrêz nayên guhdarkirin û hezkirin. Bi rêzgirtin û guhdarkirinê, kesayet di nava civakê de cihê xwe digire û tê hezkirin.

## A. Rêzgirtina nirxên civakî:

Di destpêkê de divê em zanibin nirxên me yên civakî çi ne û çima pêwîst e em li hemberî van nirxan rêzdar bin?



Nirxên herî bingehîn ên dîrokî, nirxên ku hebûna mirov, civak û gel diyar dikin, mîna: **cejinên olî, rêgez û kevneşopiyên sincî û hwd in.**

Ji bo gelê kurd nirxên civakî yên bingehîn: **pakrewan, netew, ziman, çand, rojên taybet, bîranîn, cejinên netewî û hwd.**

Ji ber ku dîrok û çanda gelê kurd bingehê mirovahiyê ava kiriye û xwediyê dewlemendiyeke pir mezin e, her tim ev dewlemendî bûye amûrek di destê desthilatdaran de. Gelê kurd ji bo hebûna xwe biparêze, li hemberî êrîşên pir mezin li ber xwe daye.

Ji bo ku mirov erkên xwe pêk bîne, pêwîst e zarok û ciwanên kurd, beriya her tiştî dîrok, çand, sinc, rastiya xwe nas bikin, xwe zana bikin û bi vîneke azad, jiyanê bikin armanca xwe.

Ev, bi taybetî bi nûnertiya mirov tê berdewamkirin û bi hevkariya her kesî tê bibîranîn. Dîroka kurdan, dîroka berxwedan û serhildanan ne. Di vê dîrokê de hemû nirxên me hatine diyarkirin. Her yek ji wan bingehên dîrokê bi gavên mezin û bi zanabûna azadiyê nivîsandiye. Li gorî van nirxandinan, her nirxekî civakî avakirina sincê civakê ye. Ger

kesayet û civak bê van bên hiştin an jî ew bi xwe, xwe ji van nirxan bêpar bihêlin, nikarin xwe bigihînin pêşerojên rast. Li gorî van rastiyan pir girîng e ku em xwedî li wan derkevin û encamên baş bi dest bixin.

## B. Rêzgirtin û pêkanîna rojên hevpar ên civakê:

Gelek xebat û kevneşopiyên civakî yên bi hev ve girêdayî mîna: **rojên taybet, bîranîn, cejin, şahî, dêlindêz (merasîm), sersaxî** û hwd hene. Her wiha rojên ku civak bikarin li hev xwedî derkevin û van rojan bi hev re parve bikin jî hene.

Dema hebûna mirov û civakê dikeve bin metirsiyê, divê bi yekbûneke giştî ya civakî li hemberî van bûyeran helwest bên nîşandan. Bi taybetî, ev yek bi meş û civînan tê lidarxistin.

Ji bo çarekirina pirsgirêkên heyî û avakirina civakeke sincî û polîtîk, guftûgo, sazûmanî û pêşxistina pirojeyan, girîng e. Di van bûyeran de hevkarî û alîkariyeke giştî ji her mirovê civakî tê xwestin. Endamên civakê çi qas zana û bikêrhatî bin, ew civak xwedî zanist e. Mirovên ku rêgezên hevpar ên civakê pêk neynin, nikarin bibin xwedî kesayetine sincî.





**ÇARŞEMA SOR** **CEJNA AKÎTO**





**CEJINA QURBANÊ** **GORISTANA ŞEHÎDÊN AZADIYÊ**

## Pirsên Nirxandinê:

1. Ji bo gelê kurd, nirxên civakî yên bingehîn çi ne?
2. Bi çend mînakan rojên hevpar ên civakê diyar bike.
3. Hebûna mirov û civakê dema ku dikeve bin metirsiyê, çawa tê parastin?
4. Hevoka rast bi (R) û ya şaş bi (Ş) nîşan bike.

**A.** Hişmendiya rêzgirtinê, rêgezeke bingehîn a sincî ye. (   )

**B.** Rêzgirtin, hewldaneke sincî ya civakî ye. (   )

**C.** Civak û gel nirxên herî bingehîn ên dîrokî ne. (   )

**Wane 3**

## Rêzgirtina Baweriyên Civakî

Ji dema civaka xwezayî û heya roja me ya îro, mirovan nirxên herî pîroz ava kirine û baweriya xwe bi wan anîne. Mirovên destpêkê baweriya xwe bi xweza, jin û hebûnên ku sûdê didin civaka wan, anîne û pîroz kirine. Bi demê re pêxember derketine û mirovan baweriya xwe bi ola wan anîne. Her civakek xwedî baweriyên cuda ye û pêwîst e her mirov ji baweriyên mirovên din re astengiyê çêneke.

**Her mirov û civak bi hizir û baweriyên xwe azad in.**




Mafê tu mirovî tune ye ku ji bawerî û nirxên mirov û civakan re astengiyan çêbike. Pêwîst e li hemberî baweriyên civakan, rêzê bigire.

Di roja me de ol di destê dewletan de, bûye amûreke ramyarî. Bi vê dixwazin hêz û bawerêya gelan ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj, bi kar bînin. Ev bi xwe li hemberî baweriya gelan bêrêzî ye. Ev mijareke girîng e û divê kûr were lêkolînkirin, ji ber ku bi çand û sincê civakê ve girêdayî ye. Ji ber hinek aliyên fêrbûna mirovan ku bi navê olê hatine lipêşxistin, mirov dixin bin bandora tengezariyan û nahêlin hizirandineke rast ava bibe.

Di dîroka mirovahiyê de kevneşopiyên herî bingehîn parvekirin, danûstandin, wekhevî, şêwirîn û ji bo azadî û serxwebûna xwe têkoşînkirin e.

## Rêzdariya mirovan li hemberî kevneşopiyên civakê



Dema em dibêjin kevneşopî, gelo çi tê fêmkirin?

Kevneşopiyên civakê çi ne?

Mirov xwedî taybetiyên civakî ye, ev jî bi xwezayî di tevgerên mirovan de nirxên çandê ava dike. Di heman demê de hatina mirovan a li cem hev kombûnê ava dike. Bi demê re nirxên ku tên bi dest xistin, di hizir û tevgerên mirovan de bi cih dibin. Mirov, bi qasî ku fêm dike xwe tev li wê dike û li gorî giyanê demê dijî.

Pirsgirêka bingehîn a ku em jê fêm bikin, nirxên ku bi şêweyê kevneşopî hatine avakirin, çawa serhev kombûne û çawa gihîştine asteke heyberî û rewanî? Berhemên ku bi şêweyê xelekên ku li pey hev rêz bûne, di bingehê xwe de li ser du xalên sereke ava bûne:

**Xala Yekem:** Li ser bingehê jiyaneke hevbeş; ê ku civakê bi kêfxweşiyeke mezin bi hev ve girê didin, nirx in.

**Mînak:** Di civaka kurdan de mêvanperwerî, xweşbînî, hevkarî, berxwedanî û hwd, kevneşopiyên binirx in.

**Mînak:** Pîvanên hezkirin û rêzgirtinê, di nava civakê de herdem raberkirinên hest, rewan û kêfxweşiyê ne.

**Xala Duyem:** Qalibên ku pêwîst bûn bihatana derbaskirin, di hizir, mirin û hebûna civakê de hatin dubarekirin. Hişkbûneke pir mezin ava kirin.

**Mînak:** xinizî (xiyanet), derew, xwemandelekirin, berjewendîperestî, fêlbazî û hwd.

Rêgezên ku xwe dispêrin zorê, ji bo hebûna xwe nekirine sedema jiyanê, lê belê bi demê re guhertinên cuda derdikevin holê.

Kevneşopiyên ku xwe nespêrin pêwîstiyên civakê û xwe bispêrin zorê, bi demê re di nava civakê de dubarebûnê bi pêş dixin û weke kevneşopiyekê, xwe berdewam dikin.

Di nava civakan de sedema ku hêza dînamîk, ango hêza bingehîn, her di nava nakokî û pevçûnan de ne û li hemberî nêzîkatiyan, nerazîbûn dane diyarkirin, bingehê xwe ji şerê di navbera kevneşopiyên xwezayî û kevneşopiyên xwe dispêrin zorê de, digire.

Di nava gelê kurd de kevneşopiya herî girîng li hemberî bêmafî û koledariyê berxwedana ku nîşan kiriye.

**Mînak:** Pîrozbahiya Newrozê ji dema Zerdeşt û Kawayê Hesinkar, heta roja me ya îro, weke kevneşopiyekê hatiye berdewamkirin. Di vê rojê de xwe dibîne û 21'ê Adarê weke

cejineke netewî pîroz dike. Ev mînaka ku me diyar kir, ji kevneşopiyên baş in.

Hinek kevneşopî jî hene, ku kevneşopiyên nexwezayî ne û nebaş in, ji sûdê zêdetir, ziyanê didin mirov û civakê.

Ji van kevneşopiyan: **berdêlî, next (qelen), şûkirina (zewaca) di temenekî biçûk de û hwd.** Kevneşopiyên ku nirxên civakê diparêzin, sûdê didin mirov û civakê, pêwîst e em li hemberî wan nirxan, rêzê bigirin û xwedî li van nirxan derkevin û biparêzin. Erkên ku dikevin ser milê me, pêk bînin. Li hemberî kevneşopiyên nebaş jî, têkoşînê bikin, xwe û civaka xwe ji van kevneşopiyên nexwezayî û nebaş, rizgar bikin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Mirovên destpêkê, baweriya xwe bi çi anîne?

2- Di dîroka mirovahiyê de kevneşopiyên herî bingehîn diyar bike.

3- Hin kevneşopiyên nexwezayî û nebaş di civakê de diyar bike û nerînên xwe bide.

4- Hevokên li jêr sergihayî bike:

A. Her mirov û civak di hizir, ..................................


B. Bawerî bi taybetî bi çand û sincê civakê ve……

C. Pîvanên hezkirin û rêzgirtinê di nava civakê de…..........

**Wane 4**

## Hezkirin

Mirov, rojane taybetiyên xwe bi kar tîne. Ev taybetî di xwezaya mirov de hene. Bi van taybetiyan mirov jiyana xwe xweş dike. Her mirovek rojane kedê dide. Bi wê kedê dihizire û bi hizra xwe kêfxweş dibe û dikene. Bi wî kenî lîskekê dike û her çaran bi hev re hezkirinê di kesayeta xwe de, ava dike.




Ji bo ku hezkirin wateya xwe ya bigehîn bigire, hezkirin beriya her tiştî xwegihandina rastiya mirovbûnê ye. Mirov bi hezkirinê dibe mirov û beriya her tiştî pêwîst e, ji jiyanê hez bike.

Hezkirin, di mirovan de nîhad û sincê li hemberî derdor û nirxên civakî û mirovahiyê ye. Mirovên ji derdor, civak û welatê xwe hez dikin, li hemberî nirxên mirovahiyê xwe berpirsyar dibînin.



Ji bo di civakê de aramî û kêfxweşî were jiyîn, hezkirin di rista sereke de ye. Ji bo xweşikbûna jiyanê, beriya her tiştî pêwîst e endamên civakê li hemberî nirxên civakî, bi hestên rast û durist, nêzîkatiyê çêbikin. Ev jî bi hezkirinê çêdibe. Mirovên ku tenê bi berjewendiyên xwe yên kesî bihizirin û xwe ji daxwaz û hizirên nebaş rizgar nekin, nikarin hest û ramanên hezkirinê di xwe de ava bikin.

> Kesên ku ji jiyanê hez dikin dikarin wateyê bidin jiyanê û wê xweşik bikin.

Mirovên ku hezkirina wan lawaz e û tenê bi berjewendiyên xwe yên kesî dihizirin, ew mirov ji civak, welatê xwe û xweşikbûnên jiyanê bêpar dimînin û weke robotekî tên bernamekirin. Nirxê mirovên wiha di nava civakan de, tune ye. Mirovên ji hezkirinê bêpar in, her dem bi tenê ne û mirov bi wan re hevaltiyê nakin. Divê hezkirin jî, bi rêgez, çand û sincên

Mirovên ku di kesayeta xwe de hezkirinê ava nekin, nikarin sûdê bidin xwe û derdora xwe jî.

civakî ve girêdayî be. Îro bi navê hezkirinê gelek rewşên dijmirovî û hestyariyê tên jiyîn. Gelek tiştên nebaş û tevgerên ne li gorî civaka me, bi navê hezkirinê li pêş dikevin.

Hemû pergalên desthilatdar û saziyên girêdayî wê, di bin navê hezkirinê de pêşketinên ku çêdikin, bi berjewendî û xwestekên wan ve girêdayî ne. Ne ji bo hezkirina mirov û ya civakê ne. Hestên hezkirinê yên îro tên jiyîn, ne hezkirineke rast e. Tenê di aliyê zayendî de ev gotin û hest hatine tengavkirin.

Mirovên ku hezkirina wan lawaz e, weke darên zuha ne.

Mirovên ezez, ji derveyî rastiya civak û xwezaya xwe, tenê di aliyekî de hestên hezkirinê dijîn, nikarin hezkirineke rast bi derdora xwe re parve bikin. Em nikarin ji bo van hestan bibêjin hestên hezkirinê. Her çi qas van hestan bijîn jî, ew nabe hezkirineke rast û wê bimînin xwediyê hestên hezkirinê yên zuha. Gelek şêweyên hezkirinê hene. Dema ev hemû bi kesayetê re hatin jiyîn û pêdiviyên van hemûyan hatin bicihanîn, wê demê mirov dikare bibêje ku ew mirov xwedî hestên hezkirineke rast e.

Di roja me de weke hezkirina keç û xortekî yan jî, hezkirina malbatê tê nirxandin, lê divê hin jî berfirehtir û kûrtir were destgirtin.

Çanda hezkirinê bi hin rêgez û taybetiyên civakbûnê ve girêdayî ye. Her mirov di serî de divê ji welat, mirov, gel, xweza, heval, hevalbend û endamên malbata xwe hez bike û ji bo hezkirinê kedê bide.

## Pirsên Nirxandinê:

**1-** Hezkirin di navbera mirovan de, çi ye?

**2-** Kengî kes dibe xwediyê hestên hezkirina rast?

**3-** Hevokên li jêr sergihayî bike:

**A.** Kesên ku ji jiyanê hez dikin dikarin ....................

**B.** Kesên ku di kesayeta xwe de hezkirinê ava nekin.......................................................

**C.** Kesên hezkirina wan lawaz be û tenê di berjewendiyên xwe yên kesî de dihizirin..........................................

**D.** Kesên ji hezkirinê bêpar in û her dem bi tenê ne…………………………………………

**E.** Mirovên ku hezkirina wan lawaz e.........................

**F.** Mirovên ku ji welat, gel û nirxên civaka xwe hez nekin………………………………………….

**Wane 5**

# Hezkirin 2



## Hezkirina welat

Mirov û civak, ji xaka ku li ser ji dayîk bûne û li ser mezin bûne, hez dikin û pê ve girêdayî ne.

Berpirsyariyên wê pêk tînin, diparêzin, jê sûdê digirin û li ser dijîn. Ev dibe cih û wargeha mirovên ku bikarin jiyana xwe bidomînin. Her ku ev hest bi pêş dikeve, bi kesayetê re hezkirina welat jî, pêş dikeve. Mirov ji bo vê hezkirina xwe dikare tê bikoşe. Bi hemû çavkaniyên çand û sincê xwe dikare hezkirina xwe bi derdora xwe re parve bike û bide jiyîn. Mirovên ku van rêgezan pêk bînin, erka xwe ya welatparêziyê jî, bi cih tînin. Gelek mirovên ku li gelek deveran jiyane, lê belê di derbarê zanebûna welat û welatparêziyê de tenê xwedî têgeha welat a pergalê ne, hene.



Di rastiyê de welat, ne di wateya erdnîgarêya ku bi tixûbên (sînorên) dewletê hatine xêzkirin û bi **yek ziman, yek al, yek netew û yek çandê** ve tê nasîn. Di hizirê mirovan de çawa ku tixûb nayên çêkirin, di derdora çand û sincê civakê de jî, tixûb nayên danîn. Ji ber van rastiyan, her parçeya axa ku li ser tê jiyîn, dibe welat.

Hezkirina welat bi nasîna welat, fêmkirin û girîngiya welatê xwe dest pê dike. Mirovên ku di derbarê welatê xwe de xwe negihandibin zanisteke berfireh, nikarin ji welatê xwe hez bikin, ger ji welatê xwe hez nekin, nikarin ji bo welatê xwe, kar jî bikin. Mirov, li ser wê xaka ku jê hez kiriye, bi komên mirovan re di nava danûstandinan de ye. Ev, li ser bingehê rêzdayîn û hezkirinê bi pêş dikeve.

## Hezkirina mirovan:

Civakên ku hezkirina wan mezin e, ew civak dikarin xwe bigihînin wateya jiyanê.

Hezkirin: hizir, raman û giyanê mirov paqij dike, wijdanê wî ava dike û ji taybetiyên xirab ji wî dûr dixe.

Civak ji mirovan pêk tê, endamên civakê dikarin li ser bingehê hezkirina rast, wekhev, parveker û azad, bi pêş bikevin. Ev hezkirina kûr, li ser bingehê parastin û rêzgirtina hev, bi pêş dikeve.

Bi taybetî, ji vî hestî re mirovperwerî tê gotin. Kesên mirovperwer, xwedî zanebûnên fireh û kûr in.

**Mînak:** Hevaltiya ji zaroktiyê, hezkirin û girêdaneke pir mezin di nava mirovan de çêdike û ew zarok heta mezin dibin bi hev re dimînin.

Li hemberî mirovên derdora xwe hestên dijîtî, neyartî û dijminahiyê nake û hezkirina hemû mirovan bingeh digire. Ji ezezî û aciziyê, dûr e. Xwedî çarereya pirsgirêkên gelêrî ye. Bi derdora xwe re di nava danûstandinên rêzdar û hezkirinê de ye. Bi dilpakî û xweşikiya hestên xwe, derdora xwe dinirxîne û ji her mirovî hez dike. Ev taybetiyên civaka komînal û wekhev in.

Ji her mirovî re bi awayekî wekhev nêzîkatiyê dike û xwedî hêzeke mezin e.

**Bingehê avakirina civakeke xwedî çand û sinc, hezkirin e.**

Di dema me ya niha de kesayet bi rêya bikaranîna şaş a teknîk û teknolojiyê ji hev hatine dûrxistin.

Êdî kesayet gihîştine asteke ku nikarin hev binasin û ji hev hez bikin. Ev nîşana xerabbûna civak û jiyanê ye.

**Mînak:** Du kes li cihekî rûniştine û bi hev re li ser Whats app ê dipeyivin û tiştan ji hev dixwazin ev jî tembelbûna mirov diyar dike.

Divê kesayet di serî de, xwe ji van helwest û hewldanên nerast rizgar bike, bikeve nava têkiliyeke hevpar û hezkirineke rast.

## Hezkirina gel:

Ji dîroka mirovahiyê heya roja me, civak û gelên cur bi cur li ser bingehê hizirandin, danûstandin û bihevrejiyînê, jiyana xwe ava kirine. Lê bi demê re, di nava civak û gelan de hinek mirov û kom ji vê rastiya mirovahiyê dûrketine û bûne xizmetkarên hêzên desthilatdar. Ev tevgerên dijî hezkirina gelan, bûne sedema ku cudahî û xerabî bikevin nava civak û gelan, ji ber van parçebûnan, gelek nexweşiyên civakî derketine holê. Ji bo ev nexweşiyên civakî werin derbaskirin, di serî de divê mirov li xwe vegere û van taybetiyên li dijî çand û sincê civakê di xwe de, pêk bîne.

Her ku mirov xwe bigihîne encamên rast û zanabûneke gelêrî, dikare van nakokî û nexweşiyan ji holê rake. Lê divê di mirov de ev bên pêk anîn. Mirovên ku di kesayeta xwe de wekhevî û zanabûna wekheviyê ava nekin, çi qas qala van diyardeyan bikin jî, nikarin serkêşiya civakê bikin.

Hezkirin, bi hevrebûna gelê me û gelên xwedî nasnameyên din jî ye. Hemû gel li gorî hezkirina xwe ya mirovahî hez dike û rêzê digire.

**Divê di nava gelan de cihkariyên olî, reng, nijad, ziman û çandî nebin. Her kes di xwezayê de xwedî mafên wekhev in.**

## **Pirsên Nirxandinê:**

**1-** Erkê mirov li hemberî welatê wî, çi ye?

**2-** Kesên mirovperwer çawa tên nasîn?

**3-** Hevoka rast bi (R) û ya şaş bi (Ş) nîşan bike:

**A.** Hezkirina welat bi nasîna kesaytî re ye . **( )**

**B.** Ger ji welatê xwe hez neke, nikare ji bo welatê xwe kar jî bike. **( )**

**C.** Tevgerên dijî hezkirina gelan bûne sedema ku cudahî û xerabî bikevin nava civak û gelan. **( )**

**Ç.** Hezkirin, bihevrebûna gelê me û gelên xwedî nasnameyên din jî ye. **( )**

**Wane 6**

## Hezkirin 3

## Hezkirina xweza û lawiran

Dema mirov ji rastiya xwe û ya xwezayê dûr dikeve, nikare hez bike. Em ji bîr nekin ku em beşek ji xwezayê ne. Bi vê wateyê, mirov dema ji xwezaya xwe dûr dikeve, nikare ji xwezaya duyem û hemû zindiyên heyî hez bike.




Lê dema mirov xwe beşek ji xwezayê dît û hebûna xwe bi hebûna xwezayê ve girê da, wê demê dikare ji hemû zindiyan hez bike û xwedî li wan derkeve. Di xwezayê de şînatî û lawir beşek ji vê cîhana giyaneweran e. Ew jî weke mirovan xwedî hest û hêjatiyan in û ji wan sûdê digirin.

Bi wan re jiyan dewlemend dibe û hevsengiya xweza û gerdûnê diparêzin. Weke çandeke mirovbûnê divê ji lawir û xwezayê jî were hezkirin û divê ji rastiya wan, neyên dûrxistin.

Çawa ku darek di dem û warekî de li gorî demsala xwe neyê çandin, şîn nabe. Lawir jî divê li gorî taybetiyên wan werin xwedîkirin, parastin, hezkirin û xwedî li wan derketin.

## Hezkirina hevaltiyê:

Hevaltî û rêhevaltî li ser armanc û danûstandinên mirovan ava dibin û parvekirinên xweser bi xwe re tînin. Ger hevaltiyeke rast û durist li pêş bikeve, wê bi xwe re encamên baş bîne. Pêwîst e, mirov xwedî taybetiyên civakbûneke rast be. Divê her dem di nava peywendiyên bi hev re danûstandinê de be. Di civakan de hezkirina rast hatiye lawazkirin. Em nimûneyekê ji malbatê bidin: **Dayik, bav, xwişk û bira.**

- Di jiyana rojane de, nêzîkatiyên wan bi hev re çawa ne?
- Dayîk û bav mafê zarokên xwe çi qasî dinasin?
- Çi qas zarokên xwe xwedî maf û xwedî nêrîneke azad mezin dikin?
- Zarok çi qasî ji keda dayik û bav û mezinên xwe re rêzê digire?
- Çi qas nirx dide?

Pêwîst e em bikaribin bersiva van pirsan bidin. Ji ber ku di roja me de nexweşiya ezeziyê gelekî li pêş e, ev nêzîkatî jî, dihêle ku nêzikatiyên berjewendîperestî derkevin holê. Ev nêzîkatî bandoreke neynî li ser têkiliyên hevaltiyê dikin. Ciwanên me di nava qalibên jiyaneke gelek hişk û tund de hatine mezinkirin. Bi taybet rêgezên hişk ên ku di navbera civakê de hatine avakirin, rêyên hevaltiyeke rast dane fetisandin.

**Ji bo em bikarin hevaltiyeke rast bi pêş bixin, pêwîst e xwe ji nexweşiya ezeziyê rizgar bikin.**

Cîhana mirov û ciwanan a pir dewlemend heye. Hevaltiya ku li ser bingehên berjewendî, fêlbazî û nebaşiyan pêş bikeve heta demekê û şûnde gelek xerabiyan, bi xwe re tîne. Divê bi çanda xwe ya dewlemend hêza ciwantiyê bi kar bîne.

## Pirsên Nirxandinê

**1.** Pêwîst e mirov bi çi awayî nêzî xweza û lawiran bibe?

**2.** Nêzîkatiya xwe ji xweza û lawirên derdora xwe diyar bike.

**3.** Çi pêwîst e, ji bo em karibin hevaltiyeke rast bi pêş bixin?

**4.** Valahiyên li jêr dagire:

**A.** Di xwezayê de ......... û ....... beşek ji vê cîhana giyaneweran e

**B.** Di civakan de hezkirina rast hatiye ............

**Wane 7**

# Berpirsiyarî

**Sinc, beriya her tiştî berpirsyarî ye. Ji bo vê, hizira bingehîn a ku sinc bi mirov re dide çêkirin, berpirsyarî ye.**

Berpirsyarî, zanabûna rast a civakbûnê ye. Mirovên ku nasnameya xwe ya civakbûnê zanibin, xwe li beramberî erk û berpirsyariyên ku pêwîstiya civakê pê heye, bi cih tînin.

Berpirsyarî ji nêz ve bi wijdan re jî, têkildar e. Mirovên bêwijdan xwe berpirsyar nabînin. Ên ku xwe berpirsyar nebînin jî, nikarin tu tiştî pêk bînin. Mirovên berpirsyar li beramberî bêdadiyê derdikevin, herdem alîgirê mafdayînê ne.

Hemû pirsgirêkên civakê wekî pirsgirêkên xwe dibînin, hemû êş û nexweşiyên civakê ji bo çare bikin, xwe erkdar dibînin. Mirovên ku xwe berpirsyar dibînin, nasname û nirxên civaka xwe diparêzin û bi pêş ve dibin û ji welatê xwe hez dikin. **Mînak:** Xwendekarê/a jîr xwe berpirsyarê dibistan, heval û perwerdeya xwe dibîne û nirxê civaka xwe diparêze.

Mirovên berpirsyar, li beramberî êrîşên fîzîkî û çandî yên li ser çand û sincê civakê, xwe nadin paş û têkoşînê dikin. Mirovên berpirsyar divê cîhanê weke mala xwe bibînin û li gorî vê rastiyê tev bigerin.

## Ji her kesî re nêzîkbûna wekheviyê:

Di hemû mercan de wekheviya jiyînê, mafê her kesî ye. Dibe ku di milê biyolojîk û fîzîkî de cudahiya her mirovekî hebe. Rengê çav, por û çerm neşibin hev, lê belê ev nayê wê wateyê ku cudabûneke çînîtî pêşbikeve û newekheviyek çêbibe.

Civaka xwezayî ev pîvan û rêgez di jiyana xwe ya rojane de pêk aniye. Wekhevî nayê wateya ku hemû mirovên yekreng, yeknijad, yekçand û yeksinc wekhev in. Her mirov bi rengê xwe, çanda xwe, zimanê xwe û hebûna xwe ya civakî xwe tev li jiyana civakî kiriye. Di hemû nêrîn û nirxandinên pergalên desthilatdaran de, cudahî û newekhevî heye. Ji ber ku pergal xwe li ser vê newekheviyê ava dike. Di nava civakan de çi qas newekhevî û cudabûn hebe û mirov çi qas ji hev bên qutkirin, pergal baştir dikare desthilatiya xwe çêbike. Yek ji rêgezên sinc jî, wekhevî ye. Mirovên bisinc, wekhev nêzî derdora xwe dibin. Mirov di nava civaka xwe de weke ku bi pêdiviyên xwe dihizire, pêwîst e pêdiviyên derdora xwe jî bizane û ji wan jî, berpirsyar be. Di roja me de mirov, ji ziman, çand, sinc û hwd, hatiye dûrxistin. Ji aliyê desthilatdaran ve yekrengî hatiye ferzkirin. Ev yek bi taybet ji aliyê kapîtalîzmê ve weke neçariyekê tê pêşkêşkirin, lê mirov bi têkiliyên xwe yên xwedî çand, sinc û wekhev dikare bibe xwedî kesayeteke azad.

## Cudakarî di civakê de:

Di xwezayê de mafê hemû zindiyan heye ku bi azadî û bi rengê xwe bijîn. Di çêbûna gerdûn û cîhana me de, her hebûn ji bo dewamkirina jiyanê hev sergihayî dikin. Tu tişt vala ava nebûye.

Di çêbûna her zindiyî de sedem û armancek heye. Zindiyên em bi çav dibînin û yên ku bi çav nayên dîtin, bandorê li hev dikin.

Komên mirovan ji dema civaka xwezayî heta niha bi gelek cureyên nijadî dabeş bûne, bi gelek ziman, çand û kevneşopiyên cuda jiyane û hîn jî dijîn. Ev taybetiyên di nava wan civakan de nabe cudakariya civakan, lê belê dibe cihêrengî û dewlemendiya wan.

Nimûne: Her civakek bi zimanê xwe dikare baştir biaxive. Bi cilûbergên xwe dikare xweşiktir bibe. Bi kevneşopiyên xwe xweşiktir dikare bijî. Bi armanc dikare baştir xwe bi rêxistin bike. Lê Piştî hezarê salan jiyana azad û xwezayî dorpêç bû, hêzên berjewendîperest cudahî xistin nava mirovan. Ev nêzî pênc hezar salî ye cudahî heye û hîn jî berdewam dike. Cudahiya ku xistine nava civakan, bû sedema şer û pevçûnan. Di van şer û pevçûnan de bi sedan ziman, çand û civak tune kirine. Civakan ji bo zimanê xwe yê zikmakî û hebûna xwe, pir têkoşîn kirine.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Wekheviya di civakê de pênase bike.

2- Bi çi awayî, civak li dijî cudakariyê sekinî?

3- Li ser civaka kurdan di warê cudakariyê de çi hat çêkirin, lêkolîn bike.

4- Hevokên şaş ên li jêr, sererast bike.

A. Wekhevî tê wateya ku cudabûneke çînayetî çêbe.

B. Yek ji rêgezên sinc,  wekhevî ye.

C. Civaka xwezayî, newekhevî pêk aniye.

**Wane 8**

## Di civakê de bêmafî û mafdayîn

**Mafê her mirovî di warê hizir, berpirsyarî, tevger û xwefêrkirinê de, heye.**




Di roja me de bi navê mafê mirovan, gelek bê mafiyên mezin tên kirin.

Mirov dikare hemû xerabiyan bike û di bin perdeya zagonê de xwe paqij derxe. Maf li ser bingehê çand û sincê civakê tê diyarkirin. Mirovên xwedî çand û sinc, xwedî wijdana mirovbûnê ne, dikarin wateya mafê mirov û civakê bizanin û bi cih bînin. Dema çînîtî derdikeve holê, mirov mafên xwe yên mirovahî û xwezayî winda dike.

Beriya ku hêzên desthilatdar û çînîtî derkevin pêş, di civaka xwezayî de, jiyaneke hevbeş hebû û weke hev dijiyan. Mirov û civak xwediyê mafên xwe yên xwezayî û azad bûn. Di civaka xwezayî de, her mirov li gorî hêza xwe tev li jiyanê dibû, ked dida û xwedî mafên jiyaneke azad bû.

Bi desthilatdariya şamanan re, bêmafiyên pir mezin di nava civakê de hatin bi pêş xistin. Keda dayîkê û nirxên civakê hatin dizîn û desteserkirin. Ji avabûna şaristaniyê (berêya pênc hezar sal) heta roja me, mirov ji mafên xwe yên xwezayî bêpar mane. Bi hezarên salan mirov û civakan ji bo ku mafên xwe yên azadî û wekheviyê bi dest bixin, li hemberî pergala desthilatdar li ber xwe dane.

Dewletên ku hatine avakirin, ji bo pergala xwe bidin rûniştandin, çand û sincê civakan lawaz kirine û li şûna wan bi navê mafê mirovan, zagon li gorî berjewendiyên xwe, çêkirine. Di milekî de mafê civak û mirovan ên xwezayî ji dest tên girtin, şer û pevçûnan derdixin pêş û di milekî din de jî, ji bo civakê bi xwe ve girê bidin, zagona dewletî derxistine pêş.

Yek ji gelên ku ji mafê mirovan bêpar mane, gelê kurd e.

Gelê kurd bi salan ji bo ku hebûn û heyîna xwe biparêze û mafên xwe bi dest bixe, berxwedaniyên bêhempa kiriye û gelek xebat û serhildan bi pêş xistiye. Ji ber ku hebûna kurdan bi tu awayî nedihat pejirandin. Hemû nirxên civakî, ziman, çand û hemû taybetiyên mirovan ji destê gelê kurd hatibûn dûrxistin. Bi salan gelê kurd ji bo azadî û mafên xwe yên xwezayî tê dikoşe. Ji bo ku mirov azadî û mafê xwe biparêze û tê bikoşe, pêwîst e dîrok û mafên xwe yên jiyanî jî, binase.

Ji bo em bikarin li hemberî bêmafiyê derkevin û bibin xwedî maf û alîgirê mafdayînê, pêwîst e em di derbarê dîrok, çand û sincê xwe de xwedî zanistên berfireh bin.

## Bi keda xwe jiyîn:



Çavkaniya kedê, ji zanabûna çanda dayîkê bingeh digire. Jiyan bi kedê bi wate û dewlemend dibe.

Mirovên xwedî ked wateyê didin hilberînên xwe, xwedî li keda derdora xwe jî derdikevin û dikarin di nava hemû şêweyên jiyanê de maf û erkên xwe, pêk bînin. Pergalên heyî bi diziya keda mirovan xwe bi hêz dikin û li ser civakê û mirovan dagirkeriyê pêk tînin. Pergala kapîtalîzmê, xwe li ser mandêl û tunekirina keda mirovan ava dike. Ev dibe sedama birçîbûn, şerên qirêj û tunekirina çand û sincê civakan. Encama ku pergala kapîtalîzmê derxistiye holê, di nava hemû welat û civakan de, şer û nexweşiyan dide jiyîn. Civakê ji kedê dûr dixe û bi xwe ve girê dide.

Mirovên ku dîrok, çand û sincê xwe nenasin, nikarin xwe binasin; mirovên ku xwe nenasin, nikarin mafên xwe jî, binasin. Wê demê nikarin ji bo mafên xwe û ji bo mafên civaka xwe jî, têkoşînê bikin.

Mirov û civakên ku ji ked û nirxên mirovahiyê hatine dûrxistin ber bi hilweşandinê ve diçin. Divê keda mirovan ji bin xizmeta van were derxistin û mirov li gorî keda ku dide, bijî. Ked di

dîroka mirovahiyê de, her dem pîroz hatiye dîtin û bi kedê re jî, mirov hatiye pîrozkirin.

Dema ku pergalên desthilatdar hatine avakirin, ji mirov re nirx nehatine dayîn û ji kedê re jî, rêz nehatiye girtin. Lê civak nirxekî mezin dide mirov û kedê. Di wê civakê de her tim rêzdayîn, hezkirin û serkeftin heye. Serkeftin û pêşketina civaka xwezayî, bingehê xwe ji vê xalê digire.

Mînak: Mirovan ji xwe têr bikin pir ked dane, bi vê kedê re nan çêkirine, ji ber vê yekê pîrozbahiya nan bi keda dayikê ve tê pîvandin û nirxeke civakî tê dîtin.

**Mirov bi hêz û keda xwe dikare pêş bikeve. Lê li ser keda kesên din nikare serkeftinê çêke û xwe li ser piyan bigire.**




## Pirsên Nirxandinê:

**1-** Encamên ku mafê civak û mirovan ên xwezayî ji dest tên girtin, çi ne?

**2-** Mirovên ku dîrok, çand û sincê xwe nenasin, rewşa wan çawa ye?

**3-** Valahiyên li jêr dagire:

**A.** Mirovên xwedîçand û sinc, xwedî................, dikarin wateya mafê mirovan û civakê bizanin û bi cih bînin.

**B.** Di civaka xwezayî de jiyaneke ............... hebû û .............dijiyan.

**C.** Di civaka xwezayî de her mirov li gorî hêza xwe tev li jiyanê dibû............ û xwedî mafên .......................... .

**Ç.** Dewletên ku hatine ......................., ji bo pergala xwe bidin .............., çand û sincê civakan lewaz kirin.

# BEŞA 5: XERABKIRINA ÇAND Û SINC

## - Xerabkirina çand û sinc

### - Bandora teknîk û medyayê di xerakirina çand û sincê civakê de

### - Taybetiyên li dijî çand û sincê civakê 1

### - Taybetiyên li dijî çand û sincê civakê 2





**Wane 1**

## Xirabkirina çand û sinc

Klan û komên destpêkê, civakên xwezayî bûn. Ji bo vê jî, mirovên ku rêgezên jiyanê pêk nedianîn, dihatin sezakirin an jî di nava civaka xwe de, dihatin dûr xistin. Di roja me de, pergalên ku hatine avakirin, bi navê nûjenî û pêşketinan li hemberî çand û sincên civakê, êrişên pir mezin kirine. Bi rêbazên cur bi cur, civak ji civakbûnê dûrxistine. Nijad kuştine, çand û sinc lawaz kirine. Ev êrîşên ku li ser civakan hatin bi pêş xistin, rê li ber nexweşiyên cur bi cur ên civakî, biyolojîk û pskolojîk, vekirine. Têkiliya mirov bi mirov û bi xwezayê re asteng kirine; mirov hêdî hêdî ji xweza û nirxên mirovahiya xwe dûr dixin.

Mirovên ku dikevin bin bandora pergala nûjeniya kapîtalîst beriya her tiştî, ji rastiya dîrok, sinc, çand û hebûna xwe ya mirovbûnê, dûr dikevin.

**Ji bo ku mirov bikare civak, dîrok û hebûna xwe biparêze, beriya her tiştî, li hemberî vê pergala heyî, têkoşîneke sincî pêwîst e. Rêya ku mirov bigihîne azadiyê jî, ev bi xwe ye.**

Perwerdeyên ku tên sazûmankirin bi rêya sazî û dezgehan, pêwîst e ji naveroka desthilatî û dewletî dûr bin. Sazî û dezgehên ku tên avakirin heke bibin weke saziyên dewletê, wê demê ew civak ji hebûna xwe ya dîrokî û sincî dûr dikeve. Sincê civakê tu caran ji holê ranebûye, lê belê hêzên desthilatdar, her dem xwestine civakê ji nirxên wê yên pîroz dûr bixin, li ser bingehê

mandêl û tunekirinê, bêsincî dane pêşxistin. Civak hatiye parçekirin, mirov ji civakê hatiye dûrxistin, bi vî şêweyî dixwazin hîmên civakê yên sereke ji holê rakin. Civak ji mirovan pêk tê. Mirov bi civakbûnê dikare hebûna xwe bidomîne. Hişmendî û sincê hov ê ku pergalê bi pêş dixin, van her du xelekan ji hev cuda dikin.

Di encamê de civakeke nexweş ku wê ber bi hilweşandinê ve dibin û bi xwe ve girê didin.

Welat û gelê ku herî zêde ketiye bin bandora vê pergalê, Kurdistan û kurd in. Bi salan li ser dîrok, ziman, çand û sincê kurdan êrîşên pir mezin, hatine kirin.

Gelê kurd çi qas li hemberî van êrîşan berxwedan û têkoşîn kiribe, di heman demê de pir hilweşandinên mezin jî, jiyaye. Bi salan, hebûn û heyîna gelê kurd nehatiye pejirandin, gelê kurd nehatiye hejmartin û li ser çar dewletên desthilatdar hatiye parvekirin. Gelê kurd ketiye di bin bandora çand û sincê Erebî, Persî û Tirkî de. Kurd ji dîrok û kokên xwe hatine dûrxistin, xwe bêbawer û biçûk didîtin, bi demê re weke wan tevger kirin, li xwe kirin û axivîn, ji sincê xwe dûrketin, her wiha sincê hov girtin û bi demê re xwe mandêl kirin.

**Mînak:** Li ser xerabkirina çand û sincê civakê, êrîşên dagirkeran li ser çand, sinc û dîroka kurdan li Xirab Reşkê û Eyn Darê û hwd li ber çavan in. Van desthilatdaran xwestin çand, sinc û dîroka kurdan ji holê rakin, lê durd ne ew kesên ku êrîş li ser nirxên wan bên kirin û li hemberî van êrîşan serî bitewînin, kurd ji bo parestina nirxên xwe herdem berxwedan kirine û dikin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Rola pergalên ku hatine avakirin, bi navê nûjentiyê, li hemberî çand û sincên civakê diyar bike?

2- Helwesta xwe ji pergalên ku dixwestin civakê xerab bikin bide xuyakirin.

3- Hevoka şaş sererast bike:

A. Ger sinc were windakirin, wê civak kom bibe û gel dê bikare xwe li ser pêyan bigire.

B. Mirovên ku dikevin bin bandora pergala nûjentiyê ji rastiya dîrok, sinc, çand û hebûna xwe nêzîk dibin.

C. Bi salan li ser dîrok, ziman, çand û sincê kurdan êrîşên pir mezin, hatine kirin.

Ç. Hêzên desthilatdar her dem nedixwestin civakê ji nirxên wê yên pîroz dûr bixin.

**Wane 2**

## Bandora teknîk û medyayê di xerabkirina çand û sincê civakê de



Pergalên heyî, ji bo ku mirovan ji civakê qut bikin û çand û sincê civakê xerab bikin, teknîkê pir bi kar tînin. Teknîk û teknolojiya ku di destpêkê de ji bo sûdê bidin civakê hatine pêşxistin, bi demê re desthilatdaran xistine bin destê xwe. Pêşxistina zanist û teknîkê çandeke bingehîn a civakê ye, lê pergala desthilatdar, teknîkê weke amûrekê ji bo xerabkirina sincê civakê bi kar tîne. Bi demê re jiyaneke ji rastiya mirovahiyê dûr derdixe û jiyaneke aşopî bi rêya teknîkê radixe ber çavan.

Di roja me ya îro de, ji vê re "**Jiyana Nîgaşî**"(Iftîradî) tê gotin. Bi rêya înternet, rojname, radyo, televîzyon, rêzefîlm, moda, fîlmên naveroka wan vala û tundiyê, derdixe pêş. Her wiha hemû amûrên ragihandinê li ser bingehê xerabkirina çand û sincê civakê bi kar tîne.

Armanc jê, jiyaneke ji rastiya mirovbûn û civakbûnê li ser bingehekî yekreng, çêbibe. Bi bername û fîlmên tên pêşkêşkirin, mejiyê mirov û civakê tên jehirkirin. Di civakê de beşên ku herî zêde ji vê pergalê bandor dibin, ciwan in.

Teknîk, ji bo jiyanê pêwîstiyek e; em nabêjin nebaş e û bi kar neynin, lê belê divê li dijî sincê civak û mirovahiyê neyê

bikaranîn. Dema tiştên ji derveyî çand û sincê civakê hatin bikaranîn, di civakan de hilweşînên pir mezin çêdibin.

**Çima ciwan herî zêde bandor dibin?**



Di civakê de hêzên herî sereke ciwan in. Ciwan, xwedîhêz û lêgerînên cur bi cur in. Her dem dixwazin tiştên nû bibînin û fêr bibin.

Ciwanên ku ji rastiya nirxên xwe dûr in, dikevin bin bandora wan û zû tên pişaftin, lê belê ciwanên xwedî zanist û hêz, nakevin bin bandorê û dibin xwedî kesayetine baş û bisinc.

Mirovên xwedî çand û sinc, ên ku bi berjewendiyên civaka xwe dihizirin, teknîk û teknolojiya heyî, ji bo sûda civak û mirovahiyê bi kar tînin. Ji bo em karibin bandora çanda biyanî li ser xwe û civaka xwe rakin, pêwîst e em li ser bingehekî rast xwe nas bikin û bibin xwedî hêzeke netewa demokratîk.

Di vê derbarê de encama ku em jê derxin, civaka ku çand û sincê xwe winda kirine, çi qas bixwaze rast bijî jî, nikare.

Dema mirov û civak çand û sincê xwe winda dike, dikeve bin xizmeta her kesî; tê hilweşandin û tunekirin.

## Jiyana ku ji dîrok û kokên xwe hatiye qutkirin.

Her zindî li ser koka xwe mezin dibe. Ev şêwe nifş û nijada wî jî, diyar dike.

- Her dar bi pel û rayên xwe dijî.

- Her çûk bi refê xwe re difire.
- Her ajal û şînatî bi hevrengê xwe re dijî.

Weke komên serbixwe, lê bi derdora xwe ve girêdayî tev digerin.

Hemû taybetiyên xwe diparêze û hev sergihayî dike, nikare weke mirovan bijî.

Mirov ji hemû lawiran (zindî) dewlemendtir e. Dikare plansaziya xwe ya demadirêj û kurt bi rêxistin bike. Ev taybetiyeke pir girîng e.

Bi taybetiyên xwe, ji cureyên lawiran cuda dibe, ji ber vê yekê, dikare li ser pêşeroja xwe bihizire.

Piştî mirov fêr dibe û bi şûn de, dikare vê fêrbûna xwe dewlemend, bihêz û berdewam bike. Di vî alî de ji wan lawiran cuda ye, lê belê pergalên heyî ji bo ku van taybetiyên mirovan pûç bikin, gelek rê û rêbazan bi kar tîne û wan taybetiyên mirovan pûç dike. Armanca van pergalan, ew e ku mirovan ji çand, dîrok û sincê wan qut bike û bi xwe ve girê bide. Dema mirov ji taybetî, çand û koka civakbûna xwe dûr bikeve, hemû şêweyên dijmirovahiyê bi kar tîne.

Dema mirov dîrok û çanda xwe nizanibe û fêrî çand û dîroka biyanî bibe (wekî dîrok û çanda xwe bibîne) ew êdî dibe endamekî pergala desthilatdar.

- Ji ziman, dê û bavê xwe dûr dikeve.
- Ji civak û kevneşopiyên civaka xwe dûr dimîne.
- Bi çand û sincên biyanî tê mezinkirin,

- Nakeve nava lêpirsîna ku bikaribe hinek pirsan ji xwe bike.

– **Gelo çima çand û zimanê xwe nizane?**

– **Çima weke mirovên bêsinc nêzî wî dibin?**

– **Çima ne li gund û bajarê xwe ye?**

– **Çima ne di nava axa welatê xwe de ye?**

– **Çima li bajarên derve, di nava karên wan de dixebite?**

Ev pirs gelek girîng in. Bi rastî jî, ji bo bersiva van pirsan mirov divê gelekî berfireh bihizire. Ji ber ku di hizirandina mirovên me yên niha de, ev pirs gelek kêm in û pêwîstiyê bi van pirsan nabîne.

Ev hemû encamên qutbûna ji dîrok û çandê ye.

Dema ku bi awayekî zanebûna sinc û çandê hizirandineke rast pêş nekeve, kesayet di nava civakê de çi qas çalak û biberhem be jî, hemû keda wî/ê vala derdikeve. Ji karê xwe tu encameke baş nikare bigire. Mirovên ku ji çand û sincên xwe qut dibin, ji kokên xwe jî qut dibin. Di encamê de ji wateya jiyana xwe, qut dibin.

Mirovên ku ji çand û koka xwe qut dibin lawaz dibin û ji mirovahiya xwe dûr dikevin û bi vî rengî dibin mirovên bêçand û sinc. Hemû taybetiyên xirab ên ku me li jor diyar kirine, divê li ser wan hizirandineke kûr û veguherîneke mezin çêbibe.

## Pirsên Nirxandinê:

**1-** Valahiyên li jêr dagire:

**A.** Ciwanên ku ji rastiya nirxên xwe …………, dikevin bin bandora wan û zû …………,

**B.** Ciwanên xwedî zanist û …………, nakevin bin bandora wê û dibin xwedî ………………… û bisinc.

**C.** Ji bo ku em karbin bandora çanda ..............li ser xwe û ......................rakin, pêwîst e em li ser bingehekî ...........xwe nas bikin û bibin xwedî hêzeke ..................demokratîk. Bandora şaş bi karanîna teknolojiya nebaş li ser mirov û civakê diyar bike?

**2-** Encamên ku mirov dema dîrok û çanda xwe nezane, fêrî çand û dîroka biyanî bibe:

A. Ew dibe endamekî pergala desthilatdar.


B. ……………………………………….

C. ………………………………………….

Ç. …......................................................... .

**Wane 3**

## Taybetiyên li dijî çand û sincê civakî 1




- **Xweperestî:**

Ji kesên ku tenê ji bo xwe dihizirin re **"mirovên xweperest"** tê gotin.

Mirovên xweperest, ji derveyî xwe nêrîn û nêzîkatiyên tu kesî napejirînin. Kêmasî û lawaziyên xwe nabînin. Nêrînên derveyî xwe, ji bo xwe weke nêzîkatiyên şaş dibînin. Pêşiya nêrînên dewlemend ên civakî digirin. Di têkiliyên xwe de gelekî teng in.

Di hest û ramanên xwe de pir lawaz in. Hemû têkiliyên xwe li ser bingehê berjewendiyên xwe yên heyberî didin çêkirin. Mirovên wisa, nikarin di jiyana xwe de bi ser bikevin.

Nikarin di jiyanê de bextewer bibin. Di xebatên xwe de nikarin tevlîbûneke rast çêbikin. Ji her pêşketin û hewldanan re bi guman nêz dibin.

Divê mirovên xwedî vê taybetiyê bi zanebûna van aliyên nebaş dev ji van helwest û nêzîkatiyên xwe berdin. Mirov çi qas bi yên derveyî xwe û bi civaka xwe re bihizire, ew qas serkeftî dibe. Bi têkiliyên xwe û yên derdora xwe re girêdayî, dikare van zanabûnên nebaş derbas bike.

### ▪ Çavnebarî:



Çavnebarî, çavtengî ye. Serkeftin, başî û serfiraziyên mirovên din ji bo mirovên çavnebar dibin sedema çavtengiyê û li hemberî wan dikevin nava tevgerên xirab.

- Li cihê ku tu pirsgirêk lê tune ne, li hemberî wan mirovan tevgerên xerab dikin.
- Çavnebarî dibe sedema dilmayîn û dijminatiyê.
- Mirovên çavnebar, ziyanê didin derdora xwe û hem jî nahêlin derdora wan bigihêje bextewariyê û di dawiyê de, xwe jî winda dikin.

- **Derew:**

- Mirovên neçar û lawaz dikarin derewan bikin.
- Mirovên derewîn di her karên xwe de newêrek in.
- Bi ser nakevin, nikarin bi plan û bername, xwe amade bikin.
- Bi derdora xwe re di nava nakokiyan de ne.
- Bi derewan dixwazin xwe ji bûyerên çêbûyî, rizgar bikin.



- Dîsa bi derewan derdora xwe dixapînin.

Bi taybet ji bo **ciwanan** derew taybetiya herî xerab e. Mirovên derewan dikin, tu kes ji wan bawer nake.

Mirovên wiha, pêwîst e xwe ji van taybetiyên xerab rizgar bikin. Ger xwe ji derewan rizgar nekin û jiyana xwe li ser derewan ava bikin, wê ji civaka xwe dûr bikevin û hebûna wan dê bikeve metirsiyê. Di civakê de derew bêsinciya herî mezin e.

Mirovên ku navê wan bi derewan derket, êdî mirov ji wan bawer nakin û wekî "mirovên derewîn" tên nasîn.

**Mînak:** Şivanê derewîn ê ku gundiyên xwe dixapand û bang li wan dikir ku gur hatiye pezê wî, lê dema gundî bi hawara wî ve diçûn, didîtin ku şivan derewan dike. Bi vî awayî gelek caran, gundiyên xwe dixapand. Carekê gur bi rastî jî êrîşî pezê wî kir. Gazî gundiyan kir, lê gundî bi hawara wî ve neçûn.

- **Dizî û çavbirçîtî:**



- Mirovên diziyê dikin her tim bi keda derdora xwe dijîn û keda wan didizin. Mirovên ku ji sinc bêpar mane xwedî gelek taybetiyên xerab in. Yek ji van taybetiyan jî, dizî ye.
- Mirovên di nava civaka xwe de bi keda xwe nejîn û bi keda derdora xwe bijîn, ew kiryara herî xirab e.
- Mirovên ku diziyê dikin dema ku derfetê dibînin, ziyanê didin derdora xwe.

**Dizî: Ew birina mal û hebûnên derdora xwe, bêyî destûr û agahî ye.**

- Kesayetên wiha ji hemû xerabiyan re vekirîne.
- Li gorî çand û sincê civakê tev nagerin, tiştên di encama diziyê de qewzec kirine bê xemxwarî difiroşin.
- Çavbirçî ne, tenê di aliyê heyberî de li ser jiyana xwe dihizirin. Çi qas xwedî mal û mewdan bin, dîsa dilê wan nearam e.
- Hertim çavên wan li derve ye.

Pêwîst e em mirovên wisa di nava civaka xwe de nepejirînin û wan rexne bikin, heta ku ew mirov dest ji van taybetiyan

bernedin, hevaltî bi wan re nayê kirin. Ji ber ku mirovên wiha ji hemû tevgerên li dijî sincê re vekirîne.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Xweperestî, çavnebarî û diziyê, pênase bike û girêdana wan bi hev re diyar bike.

2- Çar taybetiyên mirovên xweperest binivîse.

3- Çawa mirovên derewîn karin xwe ji taybetiyên xerab rizgar bikin, nerîna xwe bide.

**<u>Wane 4</u>**

## Taybetiyên li dijî çand û sincê civakê 2




### Cudahî:

Cudahî, taybetiyek ji taybetiyên mirovên ku xwe ji her kesî, cuda dibînin.

Hinek cudahî hene xwezayî ne.



**Weke: cudabûna nijad, ziman, çand, cil û berg û hwd.**

- Cudahiyên ku me li jor rêz kirin, hebûnên hemû civakan in û ji bo her kesî pêwîst in.
- Pêwîst e, ev cudahî şaş neyên bikaranîn.

Cudakarina ku hatiye jiyîn, bûye sedema çînîtî û gelek cihêbûnan.

Mirovên xwedî çand û sinc van hebûnan ji bo xwe, nakin mijarên cihêbûnê û bi her mirovî re parve dikin.

Bi salan cudakariyên pir mezin di nava civak û mirovan de hatine lipêşxistin. Mirov û civakên xwedî çand û sinc van cudakariyan napejirînin. **Çand û sincê gelê kurd, cudakariyê napejirînin**. Ji bo wê jî, bi salan ne têkoşînê dikin.

## Dijûn û dilreşî:

Mirovên ku ne xwedî çand û sincekî rast bin, ne xwedî zanebûneke mezin in. Bi nêzîkatiya hêrs û diltengiyê, derdora xwe biçûk dibînin.

Ji ber neçareya pirsgirêkan jî, bûyerên tên jiyîn, peyvên ne di cih de tên bikaranîn.

Dijûn û biçûkxistin, karê mirovên nezan û bêhêz in.

Bi taybet ev mînakên nebaş di nava malbatan de divê ji aliyê dayîk û bavan ve li ser bên rawestandin û bên derbaskirin. Mirovên xwediyê çand, sinc û hezkirineke mezin, dijûn û dilreşiyê li derdora xwe nakin.

Ji ber pirsgirêk û tiştên biçûk gelek axaftinên ne di cih de tên kirin. Ev ne karê mirovên zana û bisinc in. Divê her mirov li ser vê jî, bihizire, derbas bike û pêk bîne.

## Tundî:

- Mirovên ku ne xwediyê çanda çareyê bin, tundiyê bi kar tînin.
- Tundî ne hewldaneke mirovatiyê ye.
- Mafê mirovên pêşberî xwe tune dike.
- Dema bi dengê bilind, hêrsa xwe diyar dikin, ev dibe şêweyekî tundiyê.
- Mirovên li hemberî xwe biçûk dibînin, di milê derûnî û hestyarî de tundiyê bi kar tînin.



Ji cureyên tundiyê: pişaftina ziman, fîzîk, hestyarî û hwd.

Ev taybetî li dijî çand û sincê mirovan in.

Di roja me de li ser zarok, ciwan, jin û civakan, pir cureyên tundiyê tên bikaranîn. Di nava civaka mirovan de tu tişt nabe sedema bikaranîna tundiyê. Lê belê hişmendiya mirovan a li dijî xweşikî, rêzgirtin û hezkirina civak û kesayetê, gelek tevgerên nebaş ava kirine.

Dema civak û endamên wê bixwazin bi tundiyê pirsgirikên xwe çare bikin, negengaz e ku bigihêjin çareyeke rast û encamên baş.

## Xerabî

- Mirovên xerab di hest, raman, hizir û karên xwe yên rojane de rast tev nagerin û di jiyana xwe de nebirêkûpêk in.



- Ji ber vê yekê, di karên xwe de encameke serkeftî bi dest naxin û derewan dikin.



- Derdora xwe qirêj dikin û giyaneweran dikujin.
- Li malbata xwe guhdar nakin û li dibistanê waneyên xwe naşopînin û derdora xwe xirab dikin.
- Dema mezin jî dibin, ev taybetî nahêlin ku bibin mirovên zana û serkeftî. Bi vî awayî, civakê jî bi xwe re xirab dikin. Di encamê de xiniziyê (xiyanetê) li çand, sinc û civaka xwe, dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1-** Di roja me de sincê ciwanan bi çi rêbazan tê xerabkirin?

**2-** Tabloya li jêr bi taybetiyên li dijî çand û sincê civakî dagire:

| | |
|---|---|
| **- Çavnebarî** | - |
| - | - |
| - | **- Tundî** |
| - | - |

**3-** Tundî taybetiyeke çawa ye û çend cureyên wê hene?

**4-** Çima kurd ji dîrok û kokên xwe hatine dûrxistin?

**5-** Hevokên li jêr sergihayî bike:

**a.** Ger sinc were windakirin, wê civak belav bibe û………… .

**b.** Mirovên ku ji çand û sincên xwe qut bin……………….. .

**c.** Armanca pergalan, ew e ku mirov ji çand û dîroka wan û………….. .

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| HEFTÎ / MEH | HEFTIYA YEKEM | HEFTIYA DUYEM | HEFTIYA SÊYEM | HEFTIYA ÇAREM |
|---|---|---|---|---|
| REZBER | | | Çand çi ye? | Sinc çi ye? |
| COTMEH | Çêbûn û pêşketina çandê | Çinc û rêgezên wî | Çand û sinc di civaka xwezayî de | Pêşketina çand û sinc di serdema kevirî ya nû de |
| MIJDAR | Pêşketina çand û sinc di serdema kevirî ya nû de | Çand û sincê nûjen | Têkiliyên mirov û civakê | Têkiliyên mirov û civakê |
| BERFANBAR | Nasnameya çandî 1 | Nasnameya çandî 2 | Nêzîkatiyên li hemberî derdor û giyaneweran | Nêzîkatiyên li hemberî derdor û giyaneweran |
| RÊBENDAN | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| REŞEMEH | Rêzgirtin | Rêzgirtina baweriyên civakî | Rêzgirtina baweriyên civakî | Hezkirin 1 |
| AVDAR | Hezkirin 2 | Hezkirin 3 | Berpirsyarî | Bêmafî û mafdayîn di civakê de |
| COTAN | Xerakirina çand û sinc | Bandora teknîk û medyayê di xerakirina çand û sincê civakê de | Taybetiyên li dijî çand û sincê civakî 1 | Taybetiyên li dijî çand û sincê civakî 2 |
| GULAN | LÊVEGER | NIRXANDIN | | |